

## Nebatê ma û ma (1)

**EZ** şima ra persi nê çi çîyî, şima zanaye heme têfek ra vanî nebat î. La nameyê înan ê ziwanê ma de bipersî, zafînê şima pê nêzanî. Bêrê ewro, ma dest pê biki, hêverî nebatanê xu yê werdî, dima ra nebatanî bînan pîya bisinasni û bidi sinasnayene. **RÛPEL-11**



## Kitêbfiroşê Medyayê -I

**MEDYA KİTABEVİ** rûpelek ji rûpelên herî tije ên jiyana Selahattin Bulut e, ji rûpelên temenekî ku di ti beşekî wî de êş û kul û derd jê kêm nebûbûn. Evî rûpelê dawî ê bi êş û tahde di 1ê Adara 1996an de dest pê kiribû. **RÛPEL-13**



## Sîya Şevê û Ronahî

**"HEBÛN** an tunebûna derfetan ewqasî ne girîng e, muzîk an jî huner bi awayekî xurt were kirin, hunermend bi qeyda telefonê jî dikare karekî baş derxîne. Ma derfetên Qerapetê Xeco hebûn?" **RÛPEL-14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 11
13 - 19 ADAR 2017
www.basnews.com




PÊŞMERGE AMADE NE: S2

# PÊŞMERGEYÊN ROJ LI SER SÎNOR IN

**> JI BO BEREVANÎYA XELKÊ KURD**

Pêşmergeyên Roj amadekarîyan dikin bo derbasî Rojava bibin. Rayedarên Pêşmergeyan bo Basê aşkere kirin ku ew amadekarîyan dikin û dê di demeke nêzîk de derbasî Rojava bibin û berevanîya xelkê kurd bikin.

**> "AMERÎKA PIŞTEVANÎYA ENKSÊ DÛPAT KIR"**

Berpirsê Peywendîyên Derve Siyamend Haco ragihand nûnerên amerîkî dûpatkirine mebesta wan a serekî şerê li dijî DAIŞê ye û di çarçoveya şerê li dijî DAIŞê de ew amadene digel ENKSê û Pêşmergeyên Roj kar bikin.




**EKREM ÖNEN** >02

Ber bi Yaltayeke nû ve



**JAN DOST** >07


Derdê duzimanîyê



**FIRAT CEWERÎ** >14

Sirgûn û edebiyat

S3 SEROKÊ PDKA BAKUR SERTAÇ BUCAK:



## PKK û serwerîya Herêma Kurdistanê

"Parastina Şengalê muhîm e. Dema em li daxûyaniyên berpirsên dînê êzdiyan mêze dikin mesela lijneya wan ya bilind bi taybetî mîr Tehsîn Beg û hemûyan heta niha daxuyanî dan gotin ku Şengal perçeyekî Herême Kurdistanê ye."

S5 NÛÇE



## Dewleta kurdî çima daxwaz û pêdivîyeke navdewletî ye?

Tişta herî giring di vê derbarê de ew e ku di vê "cenga cîhanî "ya li dijî têrorê de, îro kurd di serê rimê de berevaniyê di ber hemû cîhanê de dikin.

S9 16Ê ADARA 1988AN: HELEPÇE



## Bîra Neteweyî an jî "Dayê, bêhna sêvan tê!"

Divê kurd baş bizanin ji bo çi gund û bajarên wan bi metodên dema modern yên herî kujer û xedar ji holê dihatin rakirin, lê belê deqîqe jî pê nedihesîyan.



**EKREM ÖNEN**

## Ber bi Yaltayeke nuh ve

Di vê meha dawî de li herêma Rojhilata Nêzîk û Navîn balansa hêzan, îşareta fînala pirsgirêkên herêma Rojhilata Nêzîk û Navîn dide. Wek diyar e, yek ji pirsên asasî, pirsgirêka Kurdistanê ye. Di vê meha dawî de gelek guhertinên mezin di dîplomasîya navnetewî de çêbûn ku bi herêma Rojhilata Nêzîk û Navîn ve grêdayî ne. Heger em bi Kurdistanê dest pê bikin. Wek eşkere ye berîya demekê Serokê Herêma Kurdistanê Birêz Mesûd Barzanî beşdarî civîna navneteweyî ya DAVOSê bû, di vê serdana xwe de bi gelek berpirsên dewletên cîhanê û şîrketên navneteweyî re, bi teybetî di warê enerjîyê de, hevdîtin kirin.

Civînên Barzanî diyar e gelek efektîf bûne. Îranê bi hukûmeta Iraqê re peymana ku petrola Kerkûkê di ser Îranê (Xelîcê Basra) re bifiroşe bazara cîhanê îmze kir. Piştre Hukûmeta Herêma Kurdistanê li Londonê bi şîrketa dewletê a Rûsya ROSNEFTê re peyman îmze kir ku yek ji şîrketa enerjîyê ya mezin û navneteweyî tê hesêb. Li gorî peymanê li Kurdistanê derxistina petrolê, kişfkirina cihê nû yê petrolê û firotina petrola Kurdistanê li bazara cîhanê ev şîrket dê bike. Di heman demê de şewirmendê Barzanî, Hêmin Heramî serdana Moskowê kir û di serdana xwe de gelek beyanên balkêş û stratejîk dan ku siyaseta paşeroja Herêma Kurdistanê eşkere dikin.

Herweha birêz Barzanî serdana Tirkiyê kir. Piştre bûyerên li Minbîcê çêbûn û bûyerên li Şengalê dest pê kirin (DYA û Rûsya operasyoneke muşterek kir). Serokerkanê Rûsya, DYA û Tirkiyê li Antalyayê civîyan, herweha beyana cîgirê wezîrê derve yê Rûsyayê Bagdanov di derbarê serxwebûna Kurdistanê de, serdana gelek wezîrên derve yên welatên Yekîtîya Ewrûpa (Almanya, Brîtanya, Swêd, Awûstûrya, Fransa) û herweha serdana berpirsên yekîtîya Ewrûpa bo Herêma Kurdistanê: Ev bûyer tev gelekî girîng in. Bi tevahî nazanim tevgera siyasî ya Kurdistanê ev guhertinên stratejîk ku li herêmê diqewimin çiqasî rast dişopîne lê diyar e Hukûmeta Herêma Kurdistanê heke ne bi tevahî be jî, van guhertinan dibîne û li gor wê tevdigere.

DYA û Rûsya, di dîzayna Herêma Rojhilata Nêzîk û Navîn de û bi taybetî di pirsa Kurdistanê de, wê rola asasî bilîze. Lê diyar e Îngiltereyê xwe daye kêleka DYAyê ku ew jî dixwaze di dîzayna Herêmê de xwedî rol be. Li vê derê rewşa welatên Yekîtîya Ewrûpayê ne pir diyar e lê ew jî dixwazin rolekê bigirin û xuya ye Rûsya dixwaze rolekê bide wan, ji ber wê jî di vê meha dawî de wezîrên welatên YEyê yek li pê yekî serdana Moskowê dikin. Wek diyar e bi hatina Trump ve têkilîyên DYA û Yekîtîya Ewrûpayê xerab in. Ji tevgera Rûsya û DYAyê ya li herêmê eşkere dibe ku pirsgirêka asasî Tirkiyê, Îran û welatên Xelîc bû. Diyar e welatên Xelîc anîn rayê, niha deng ji wan dernakeve, heta radeyekê Îran jî hinekî sist bûye, niha dixwazin Tirkîyê jî bînin rayê, da ku ev welatên hanê ji projeya DYA û Rûsyayê re nebin asteng. Civîna li Antalyayê ya serokerkanê DYA, Rûsya û Tirkîyeyê jî bi vê mebestê bû û li Minbîcê Rûsya û DYA ew îşaret di pratîkê de dan Tirkîyê. DYA û Rûsya ne bes ji Îran û Tirkiyê daxwaz dike ku ji wan re pirsgirêkan dernexe, herweha ji wan dixwaze ku ji peymanên ku berê çêbûne gavan bi şûn de bavêjin. Wek peymana Montro ya kendavên Stenbol û Çanakaleyê.

Li vir tişta herî girîng ku ji tevgera neteweyî ya Kurdistanê û bi taybetî ji Hukûmeta Herêma Kurdistanê tê xwestin heta bikaribin nêzî DYA, Rûsya û YEyê bin û dûrî wan welatan bin ku Kurdistan perçe kirine. Ji ber ku, îroj eşkere ye kurd bi tena serê xwe, bêyî piştgirîya ji derve, nikarin serî bi van welatan derxînin ku Kurdistan perçe kirine. Ji alîyekî din ve, ev bûyerên van şapatên dawî li Kurdistanê jî rû didin, encamên nêzîkbûna finalê ya welatên ku Kurdistan perçe kirine; ji ber hebûna DYA û Rûsyayê li herêmê bi xwe nikarin mudaxeleyî kurdan bikin. Ji ber vê jî bi destê hinek alîgirên ku li ser navê kurdan tevdigerin provakasyona dikin da ku astengîyan li ber kurdan derxin.

Divê kurd bi tevahî û Hukûmeta Herêma Kurdistanê bi taybet heta karibe neyê provakasyonan. Hewce ye kurd bizanibin, tecrûbeyên li cîhanê hene, ji me re bi awayekî eşkere rê dide ku yekîtîya neteweyî bi maneya ku niha li nava tebeqa sîyasî ya kurdan behs dibe, li tu welatan çê nebûye. Li hemû welatan hêzên ku berjewendîyên neteweyî diparêzin hene û hêzin hene ku bi zanebûn an nezanî li dijî berjewendîyên neteweyî tevdigerin. Pir heyf e ku ev tevger gelek caran digihên hidûdê şer. Ev mînak li gelek welatên cîhanê bi vî awayî bûye: wek li DYA, Rûsya, Fransa, Almanya, her weha li Afrîka, Cezayîr, Angola, li Asyayê Çîn, Vîetnam her weha li Filistîn û gelek welatên din. Tişta niha li Kurdistanê jî dibe ev e, em nakarin xwe ji vê rastîyê bidin alî, tişta ji hêzên Kurdistanî tê xwestin, wek li jor min got heta bikaribe neyê provakasyonan. An na wek niha di tebeqa siyasî ya kurdan de gotina yekîtîya neteweyî ji rastîyê wir de, gotinek obstrakt (girover) e, heke em teşhîsê rast deynin em ê jê re çareserîyê jî bibînin. Lê heke em rastîyê li pişt gotinên girover veşêrin, kurd dê her di vî halî de bin. Bi ya min, divê tevgera rizgarîya neteweyî ya Kurdistanê ev guhertinên li jor hatine behs kirin, serê xwe pêre biêşînin û li gor wê siyaseteke neteweyî û pragmatîk bimeşînin. Guhertin tev di berjewendîyê neteweya kurd de dibin. Kurdan di tifaqa Yaltay a piştî Şerê Cîhanê yê Duyem de (1945) têk çûn; bi hêvîya ku di Yaltayeke nû de Kurdistaneke azad bi dest bixin. Ji bo vê hemû zirûf hene, mesele hinekî jî bi kurdan ve girêdayî ye.



Rojavayê Kurdistanê

# Pêşmergeyên Roj li ser sînor in

**HÊMIN DILDAR**

**PÊŞMERGEYÊN** Roj zêdetir du sal in li Herêma Kurdistanê li dijî DAIŞê şer dikin û di sengerên herî pêş de derbasî Rojava dibin. Tê çaverêkirin Pêşmergeyên Roj di meha hazîranê de derbasî Rojava bibin û li dijî DAIŞê şer û beşdarîyê di şerê Rakkayê de bikin.

Li gor zanyarîyên ku heftenameya Basê ji berpirsên fermandarên Pêşmergeyên Roj stendine, hêzên sererdê yên NATOyê û Hevpeymanîya Navdewletî ku serperîştîya wê Amerîka dike bo derbasbûna Pêşmergeyên Roj digel Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî danûstendin kirine.

Heman çavkanîyê aşkere jî kir ku Amerîka ji helmetên PKKê yên têkbirina aramî û istiqrarê li Herêma Kurdistanê û peywendîyên wê digel Îranê ne razî ye. Heman çavkanîyê di beşeke din a axaftina xwe de amaje li ser wê çendê jî kirîye ku Amerîkayê ji nûnerên PKKê û YPGê yên li Qamişloyê re ragihandîye ku nabe ew hevkarîyê digel Haşdî Şabî bikin û rê li ber Haşdî Şabî ango milîsên şîe vekin. Bi wê minasebetê berpirsên Konsolxaneya Amerîkayê li Hewlêrê daxwaz ji PKKê kirine ku nebin rêgir li ber Pêşmergeyên Roj bo derbasbûna wan a li Rojava.

Li gor zanyarîyên herêmî, zêdetir ji 5 hezar Pêşmergeyên Roj amadekarîyan dikin û berê yekîneyên xwe dane sînorên Rojava û Herêma Kurdistanê

Li alîyê din Serokê Encûmena Niştimanîya Kurdî li Sûrîyê (ENKS) Îbrahîm Bro, Berpirsê Peywendîyên Derve yên ENKSê Siyamend Haco û Nûnerê ENKSê li Ewrûpa Kamûran Haco di 27ê Sibatê de serdana Washintonê kirin û rewşa dawî ya rojavayê Kurdistanê, derbasbûna Pêşmergeyên Roj bo Rojava digel nûnerên Amerîkayê gotûbêj kirin. ENKS Digel Sînatorê Komarî Brad Sherman, Komîta Pêwendîyên Derve ya Encûmena Pîran, karmendê Wezareta Derve ya Amerîka, Berpirsê Dosya Sûrîyê di Wezareta Derve Michael Ratney, Brett McGurk, Berpirsê Amerîka yê şerê dijî DAIŞê civîya.

**Îbrahîm Bro: Amerîka digel wê yekê ne Pêşmerge derbasî Rojava bibin**

Serokê ENKSê Îbrahîm Bro, ji heftenameya Basê re behsa naveroka civînên digel ENKSê kir. Bro amaje li ser wê çendê kir ku rayedarên amerîkî digel wê yekê ne Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin û wiha dewam kir: “Her alîyên amerîkî min dîtine dibêjin tiştekî gelekî normal e ku Pêşmergeyên kurdên Sûrîyê vegerin deverên xwe. Tenê tiştek ji bo amerîkîyan girîng e, ew jî şerê DAIŞê ye. Yanî ew tiştekî sereke ye ji wan re. Ew jî diyar e danûstendinan dikin geh bi Tirkiyê re geh bi Sûrîyê re, bi Artêşa Azad re, bi gelekan re dikin lê xuya dike PYD bê şert û merc bêtir alîkar e bi wan re, dixwazin wan alîyên din jî bawerîyekê bi wan re çêkin wek fêdeya ji PYDê tê kirin li dijî DAIŞê. Amerîka bi awayekî gelekî cidî li ser disekine, ji ber ku ji demeke dirêj de dixebitin da ku ev Pêşmerge derbas bin û şerekî navxweyî çênebe. Lê heta niha Amerîka bi rola xwe ya girîng, bi wê rola xwe ya mezin ve ranebû ku wî tiştî bike.”

Li alîyê din Bro behsa wê yekê jî kir ku hejmara Pêşmergeyên Roj dê zêde bibe û di demeke kurt de bibe 10 hezar. Bro siyaseta PKK- YPGê rexne kir û weha got: “Aniha pênc hezar Pêşmergeyên me dixebitin, lê karekî berfireh tê kirin ku demeke nêzîk de hejmar bigihe heta 10 hezar Pêşmergeyî û bêguman ev Pêşmerge çêdibin ji bo ku cihê xwe li Kurdistana Sûrîyê bibînin, ne li devereke din.

**“YPG xortên kurdan dike qurbanî”**

Devereke ne kurdî be, wê vegere ser rejimê, wê bigihê xwedîyê xwe. Lê tişta mestir ew e, devera xwe nikare rizgar bike û heke rizgar bike, pirs ew e kî dê îdareya wê deverê bike? Yanî em bêtir deverên kurdî dixwazin. Em jixwe dizanin şerê li dijî terorê tiştekî gelekî girîng e lê divê em sed carî bifikirin berî ku em gavekê biavêjin, berî ku em xortên xwe li deverekê şehîd bikin ku ne devereke kurdî ye. Ew dikeve berjewendîyên miletê kurd an em xelkê bi ser qurbanîyên xwe de dikin dijminên xwe? Ew tiştekî divê lêvegerek çêbibe, poşmanîyeke wan çêbibe, çawa ewqas xortên kurdan li Reqqa, li Deyrazorê didin kuştin: bi hezaran xortên kurd bûn qurbanî.

**Siyamend Haco: Amerîka piştevanîya ENKSê dûpat kir**

Siyamend Haco Berpirsê Peywendîyên Derve yên ENKSê jî ji Basê re axivî û behsa civînên ENKSê li Washingtonê kir. Haco, amaje li ser wê yekê kir ku rayedarên amerîkî piştevanîya xwe bo ENKSê û peşnimaya destûrî ya ENKSê re ragihandine. Herweha wan ragihandine ku ENKS û Pêşmergeyên Roj dikarin bibin aktorekî sereke li herêmên kurdî û ew dikarin aramî û hizûrê bînin navçeyên kurdî. Li alîyê din Haco ragihand nûnerên amerîkî dûpat kirine mebesta wan a sereke şerê li dijî DAIŞê ye û di çarçoveya şerê li dijî DAIŞê de ew amade ne digel ENKSê û Pêşmergeyên Roj kar bikin. Haco, peywendîyên PYD - YPGê yên digel Sûrîyê jî bi bîr xist û wiha got: “Amerîka piştevanîyeke leşkerî dide PYD - YPGê lêbelê ew ji peywendîyên PYD - YPGê yên digel rejimê aciz in. Amerîka PYD - YPGê weke hevalbendekî sîyasî nabîne. Peywendîyên me, yên dîplomatîk in.”

Li ser derbasbûna Pêşmergeyên Roj bo rojavayê Kurdistanê jî Haco ragihand ku dê Pêşmergeyên Roj derbas bibin û ew dê herêmên kurdnişîn biparêzin. Herweha eger rêkeftin di navbera ENKSê û dijberîya Sûrîyê de pêk were û ji wan bê xwestin, ew dikarin digel rikberîya Sûrîyê şerê DAIŞê bikin û DAIŞê ji herêmê derxin.



## MESRÛR BARZANÎ PÊŞWAZÎ LI SERPEREŞTÊ DEZGAYÊ ŞAH SELMAN KIR



Di nava hefteyê de Şêwirmendê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî pêşwazî li serperiştê Giştî yê Dezgayê Şahê Erebistana Siûdî ya alîkarîyên mirovî Dr. Ebdula Bîn Ebdulezîz Bîn Mihemed El-Erebîye kir û gotûbêj li ser peywendîyên Hewlêr û Riyadê hatin kirin.

Di civînê de Dr. Ebdula Bîn Ebdulezîz Bîn Mihemed El-Erebîye ji ber alîkarî û hewandina koçberên Iraqê spasîya hikûmet û sazîyên herêma Kurdistanê kir û amadebûna welatê xwe ya ji bo dabînkirina alîkarîyên mirovî ragihand.

Serpereştyarê giştî yê dezgayê Şah Selman a alîkarîya mirovî, herwaha ragehand ku walatê wan dixwaze peywendîyên ligel Herêma Kurdistanê berfireh bike.

Wekî din jî, Mesrûr Barzanî di civînê de spasîya Erebistana Siûdî kir û ragehand ku gelê Kurdistanê gelek bela û koçberî dîtîye, ji ber vê jî pir baş ji bela û koçberîyan fêm dike.’’

Mesrûr Barzanî Şêwirmendê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê amaje bi vê yekê jî kir ku ligel zêdebûna hejmara koçberên Iraqê yên li Herêma Kurdistanê, civaka navnetewî bi giştî û Iraq jî bi taybet wekî ku pêwîst e alîkarîya Kurdistanê nekiriye û gelek caran jî, Bexdayê rê li ber gihiştina alîkarîyên mirovî bo Hewlêrê girtine.

## Serokê PDK Bakur Sertaç Bucak:

# Divê PKK serwerîya Herêma Kurdistanê qebûl bike!



**■ SIWAR BEDIRXAN**

**SEROKÊ** PDK Bakur Sertaç Bucak, ji heftenameya Basê re axivî. Bucak, êrîşên PKKê - YBŞê yên li ser Pêşmerge û Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî bi tûndî şermezar kirin. Bucak eşkere dike ku hewce ye PKK serwerîya Herêma Kurdistanê qebûl bike û ji Şengalê derkeve. Êrîşên PKKê yên dijî Pêşmerge û hebûna wê ya li Şengalê ne di berjewendîya kurdan de ye û dibe hokar ku Şengal avadan nebe û êzdî jî her penaber bin.

**Herçend nûnerên Herêma Kurdistanê bang li PKKê dikin ku ji Şengalê derkeve lê ew derneketin herî dawî bûyerek ku nedihat xwestin rû da, ew jî bûye cîhê nîgeraniyê. PKK çima li Şengalê ye û çima arîşeyan bo Herema Kurdistanê saz dike?**

Şengal girêdayî Herêma Kurdistanê ye û li Şengalê bi piranî kurdên êzdî dijîn. Dema Seddam de li hemberî wan gelek astengî hatibûn derxistin. Wê demê dûrketinek jî çêbû. Şengal nêzîkî Herêma Kurdistanê ye û gelek eşîrên ereban jî li wir hene. Tiştê muhîm, li gor dîtina min, Şengal cîhekî gelekî stratejîk e. Yanî kî Şengalê kontrol bike ew ê kontrola Rojava, Sûriyê û hemû dewletên derûdorê bike. Yek ji wan dewletan jî Îsraîl e. Niha dewleta Îranê wê bixwaze Hîlala Şîê çêbike; li gor planên wan ew hîlal ji ser Şengalê diçe heta Lazqiyê. Li gor dîtina me hebûna PKKê li Şengalê ji bo hesabên dewleta Îranê ye, ne ji bo parastina êzdîyan e.

Em dizanin salek berê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li ser çiyayê Şengalê presskonferanseke navneteweyî çêkir, ew nimûneyeke gelekî mezin bû.

"Bi dijminatiya Serokê Herêmî Kurdistan Mesud Barzanî û bi dijminatiya Pêşmergeyan û belavkirina formansyonên qirêj liser wan xizmeta milletê kurd nake xizmeta dijminên kurd û Kurdistanê dike. Armanca wan propanganda û kiryaran jî ew e."

Cenabê Mesûd Barzanî digot; "Ew ferman ji aliyê DAIŞê ve li dijî birayên me yên êzdî hatiye derxistin, heta ku çiyayê Şengalê nekeve destê Pêşmerge û em birayê xwe azad nekin, bo me rawestan nîne." Ji bo wê dema operasyonên Şengalê jî Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî weke fermandarê Pêşmerge bi giştî di nav operasyona leşkerî de cih girt. Parastina birayên me yên êzdî tiştekî girîng e, parastina Şengalê muhîm e. Dema em li daxûyaniyên berpirsên dînê êzdîyan mêze dikin, mesela lijneya wan ya bilind bi taybetî mîr Tehsîn Beg û hemûyan, heta niha daxuyanî dan gotin ku Şengal perçeyekî Herême Kurdistanê ye. Parlemterê Iraqê yê êzdî tiştên wiha gotin, niha dema em van daxûyanîyan bidin berçav. Mesele ne meseleya parastina êzdîyan e. Îro gelê me yê kurdên êzdî li Şengalê hatine azad kirin, ya pêwîst merheleya avadaniya Şengalê ye, hebûna PKKê yan YBŞê ,ferqa wan nîne, ew ji bo avadaniyê jî dibin asteng.

**Hebûna PKKê li Şengalê di berjewendîya êzdîyan de ye?**

Êzdî niha piraniya wan penaber in, hinek ji wan li hundirê başûrê Kurdistanê hinek ji wan li Rojava û gelek ji wan jî çûne Ewropayê. Vegera wan jî girîng e, eger bi salan vegera wan bêîmkan be, wê çaxê Şengal bê kurdên êzdî dimîne, ew jî gunehekî mezin e: mirov li hember kurdên êzdî dê çawa vê yekê pêk bîne?

Bo nimûne niha YPGê şerekî gewre li mintiqeya Menbîcê kir û li gor daxuyanîyan dibêjin di şerê DAIŞê de 700 gerîlayên ciwan ên kurd hatine şehîdkirin. Îro çi bû? Hinek deverên Minbîcê dan hikûmeta BAAS a Beşar Esed. Gelo çima ewqas ciwanên me şehîd bûn? Bajar teslîmî hikûmeta Sûriyê dikin. Çima ne amede ne li Şengalê desthilatdarîya hikûmeta Herêma Kurdistanê qebûl bikin û bibêjin: "Mala we ava" û ji herêmê vekişin.

Dema şerê Kobanê, şerekî mezin qewimî, ez piştrast im û dikarim bibêjim milletê kurd ku YPGê li Kobanê berxwedaneke gewre nîşan da. Lêbelê wan nikarîbû li hember DAIŞê serkeftî bibûna û bi wan çekan xwe biparastana û bi tenê ji sedî 15ê Kobanê di destê YPGê de mabû. Wê demê Pêşmerge li gor biryara Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Parlementoya Kurdistanê û Serok Barzanî amade bû ku biçe Kobanê û ligel birayê xwe, kurdên Rojava, mil bi mil ve li hemberî DAIŞê şer bikin. Wê demê hejmarak diyar kirin, gotin çiqas dixwazin em ê ji we re ewqas bişînin. Piştre gotin bila 150 Pêşmerge be. Em dizanin wê demê çawa 150 Pêşmerge çûn û alîkarîya birayê xwe kir, mil bi mil ve şerê DAIŞê kirin; bi taybetî li ser xebata Serok Barzanî balafirên koalîsyona navneteweyî koordînat dane Pêşmergeyan û şervanan DAIŞê bombebaran kirin. Pêşmergeyan hem şer kirin him jî YPG perwerde kirin. Ji sedî 85ê Kobanê, nêzî 300 gundê li derdorê hatin azad kirin. Desthilatdariya Kobanî ji wan re got: "Em spasîya we dikin û em dixwazin hûn herin Kurdistanê." Pêşmerge wekî gerîlayên PKKê bûna ew ê bigotana em naçin, lê ev tiştekî ne rast e. Pêşmerge tê wezîfeya xwe bi cî tîne, bi helwesteke kurdistanî şer dikin, piştî biser dikevin pirsyar dikin dibêjin: "Wekî din tiştek heye em bikin?" Niha kurdistanîbûn ev e. Ya hewce û pêwîst ev e, serxwebûna Kurdistanê di rojevê de ye, heke dewleteke serbixwe nikaribe wan deveran biparêze ku bixwe azadkirine û qurbanî dane, ew dibe astengîyeke mezin li gor teamûlên dîplomasiya navneteweyî. Mesela yek argument heye ku ew gelekî muhîm e. Hebûna dewletê ji bo çi ye? Ji bo parastina hemwelatiyan xwe ye.

**Li gor enformasyonên heyî 8-9 gundên Şengalê di destê DAIŞê de ne, herweha Pêşmerge amadekarîyan dikin ku wan gundan rizgar bikin. Çavkanîyên herêmî aşkere dikin ku PKK û YBŞ dibin rêgir ku ew gund jî bêne azad kirin. Gelo kaos û bêîstîkrarîya li herêmê di berjewendîya PKKê de ye?**


Heger yek bibe asteng di nava şerê li beramberî DAIŞ de, ev helwestek e ne rast e, helwesteke wisa ye ku li dijî însanetîyê ye. DAIŞ qatîl in, hatin Kurdistanê û mîsyoneke wan hebû. Pêşmerge berdewam in li ser şerê li dijî DAIŞê.

Bi dijminatîya Serokê Herêmê Kurdistanê Mesûd Barzanî û bi dijminatîya Pêşmergeyan û belavkirina formansyonên qirêj li ser wan, xizmeta milletê kurd nake, xizmeta dijminên kurd û Kurdistanê dike. Armanca wan propanganda û kiryaran jî ev e. Mesela ez çûm, li Mûsilê Pêşmerge heta sînorên Mûsilê çûn. Sînorên Kurdistanê hemû rizgar kiribûn, heta hindek caran zêdetir çûbûn, bang li hikûmeta Iraqê kiribûn û gotibûn, ev dever ne yên me ne, yê we ne. Demekê ez çûm wê derê, Pêşmergeyan hidût tayîn dikirin, niha biryareke Pêşmerge heye, dibêje ew erdê ku min bi xwîna xwe ew azad kiriye, ev milkê Herêmê Kurdistanê ye û sînor danîne, li wan deveran qereqolan çêdikin. Maneya wê çi ye? Herêma Kurdistanê hikûmet, parlemento amade ye hem hidûdê Kurdistanê biparêzin hem jî xelkê xwe biparêzin; parastin gelekî muhîm e, ji ber ku ev wazîfeya dewletê ye. Dewlet ji bo berjewendiyên hemwelatiyê xwe heye. Dewlet ji bo çareserkirina

"Parastina birayê me yê êzdî tiştekî girîng e parastina Şengalê muhîm e. Dema em li daxûyaniyên berpirsên dînê êzdiyan mêze dikin mesela lijneya wan ya bilind bi taybetî mîr Tehsîn Beg û hemûyan heta niha daxuyanî dan gotin ku Şengal perçeyekî Herême Kurdistanê ye."

pirsgirêkên sosyal û aborî heye. Dewlet ji bo pêşveçûnên kulturî, çandî û perwerdehîya mîlletê xwe heye.

Gotina min ev e ku ew tiştên ku biraderên me yên PKKê pêk tînin dijî maslahat û berjewendiya milletê kurd e, dijî berjewendiya Kurdistanê, dijî berjewendiya dewleteke serbixwe li Herêma Kurdistanê ye û ev ti carî nayê qebûlkirin. Şengal ne milkê wan e, Şengal bi awayekî resmî wekî hidûd girêdayî Herêma Kurdistanê ye, ew daxwaz bi taybetî ya kurdên me yên êzdî ye.



## TU ÊRÎŞÊN DIJÎ NAVENDÊN ENKSÊ, GIRTIN Û ZINDANÎKIRINA NÛNERÊN ENKSÊ ÇAWA ŞÎROVE DIKÎ?

Niha dema em li rojavayê Kurdistanê temaşe dikin, di nav 4-5 salan de tiştekî dibînin. Li rojava PKK dixwaze desthilatdarîya partîyekê hebe û ne amade ye pir partîtîyê li rojavayê Kurdistanê qebûl bike. Herweha ne amade ye hebûna Pêşmergeyên Roj jî li rojavayê Kurdistanê qebûl bike lê em baştir dizanin PYD yan jî hêzên wan yê leşkerî PYD tenê heta îro gelek caran me dît ku nikarin kurdên Rojava jî biparêzin gelek caran qetlîamên mezin çêbûn, gelek însan hatin kuştin niha eger tu dixwazî dewleteke çêbikî, weke Herêma Kurdistanê; pêwîst e tu hebûna kurdên din jî qebûl bike. Heger îro li Herêma Kurdistanê ji bo partiyên din bên şewitandin, ev nayê qebûlkirin, di heman demê de li Kurdistana rojava îro dibêjin bila navê wê jî biguhere, bila bibe bakurê Sûriyeyê, yanî Kurdistan jî nabêjin ev jî pirseke mezin e. Heqê wan nîne, ev yek dijî demokrasîyê, dijî belavkirina bîr û baweriya azad e û herweha dijî teamûlên dewletbûnê ye. Yanê ev çiye? Ev heyfgirtin e? Mesela li dewleteke însanê wan bên kuştin û perçiqandin heqê wê dewletê heye bersiva wê bide. Niha tu alozîyê derdixî li Şengalê lê tu ne amade yî ku li wê derê hebûna kurdên din qebûl bikî. Ev tişt nayê qebûlkirin. Ev êrîş hovîtî ye dijî hemû teamûlên demokrasiyê. Diçin alaya Kurdistanê dişewitînin. Ew ala Herêma Kurdistanê ye, ew ala, ala Tevgera Goran e, ala YNKê ye, ala Yekgirtûya Îslamî ye, ala hemû partiyên Kurdistanê ye. Alaya hemû hemwelatîyên Herêma Kurdistanê ye, tiştekî wê yî resmî heye û dibe û em hêvî dikin ku ala dewleteke serbixwe be.

Ew êrîşên li hember rêxistinên Rojava şîddet e û tûndrewî ye. Radibin her tiştî dikîn, "xweserîya demokratîk, komara demokratîk" heta dibêjin "neteweya demokratîk" nizanim xweseriya demokratîk, demokratîka wî li ku dimîne eger tu hebûna rêxistineke ji xeynî xwe qebûl nekî û tu jiyana wan ji wan re qedexe bikî. Ev nayê qebûlkirin, ev tiştekî gelekî xirab e û dijî teamûlên demokrasîyê ye, dijî her tiştî ye.

# Newroza yekîtîyê li Rojhilat



ESKENDER CEIFERÎ

**KOMARA** Îslamî ya Îranê, tevgera partîyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partîyeke kurdî bikare hevrêzîyê di nava refên alîyên cuda de pêk bîne, dilê Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz sembola kurdan e. Ew bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine ku merasîma Newrozê bi rengekî cidî were pêşwazîkirin.

Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Komara Îslamî jî wek rejîma Pehlewî, riftarê bi kurdan re dike.

Lehengên kurdan bi dehan salan li girtîgehan dimînin. Mihemed Sidîq Kebûdvend ji ber avakirina sazîyeke mafên mirovan, bi salan di girtîgehê de ye. Mihemed Nezerî, Osman Mistefapûr û bi dehan girtîyên din ên siyasî, bi tenê heke ji Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî re daxwaza lêbûrînê binivisin, dê bene berdan.

Alîyên siyasî yên Rojhilat, herî dawî li ser pêşwazîkirina hevpar ya ji bo Newrozê li hev hatin. Belkî ev zengila metirsîyê be ji Komara Îslamî re. Ji ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partîyên nasyonalîst û komonîst yên Rojhilatê Kurdistanê nêzîkî hevdu nebûbûn.

Tevger û reftarên Îranê li hemberî kurdan, piraniya xalên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan binpê dike ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve derketine. Ew danezan di 10ê Berfanbara 1948an de hatiye pejirandin. Danezan bû belgeyeke bingehîn ji bo tekoşîna mafên mirovan li hemû cîhanê. Lê li gora dokument û belgeyan, hikûmetên weke Îranê qet guh nedan xalên wê.

### Komara Îslamî jî bêkar rûneniştîye

Piştî wê biryara han a peşwaziya hevpar a Newrozê ji aliyê partiyên kurdî ve, tevgereke bihêz di nava Sipaya Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vê carê rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyarîyên veşartî li nava Sipayê amaje dikin ku bajarên Sine, Urmiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistinê. Bi vî rengî ku endamên Sipayê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Newroza hevpar ya aliyên Kurdî bike, bê girtin. Rast e ku hemû mirov azad in û ji aliyê maf û rûmetan ve wekhev tên dinyayê. Xwedî hiş û wijdan in û divê bi hestên biratîyê nêzîkayî li hev bikin, lê divê Sipaya Pasdaran bersivê bide ku bi van kiryaran, mafên xelkê bi ku de çûne!

### Selefîyên Rojhilat jî metirsîdar in

Gelek ji çalakvanên sunnî li Îran û rojhilatê Kurdistanê di girtîgehan de ne. Lê hin aliyên selefî jî hene ku bi kiryara xwe, di berjewendîya Komara Îslamî de tevdigerin. Dema ku çalakiyeke xuya ya partiyên kurdî li navxwe tê kirin, Komara Îslamî jî dike reklam ku Dewleta Îslamî DAIŞ nêzîkî sînorên Îranê bûye û hêzên Îranê hin çekdarên wê rêxistinê girtine. Ya rast ew e ku plana herî dawî a Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma kurdî di landikê de bifetisînin. Li gora zanyarîyên çavkaniyeke veşartî a sazîya îstixbarat ango Îtilaata Îranê, eger tevlîhevî yan jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilatê çê be, dibe ku mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin ji bo dijatîya hêza kurdan.

### Gelo hilbijartin jî derfet in?

Alîyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hilbijartineke demokrat û azad birêve neçûye û ew her tim hilbijartinê baykot dikin. Endam û alîgirên wan jî deng nadin. Lê tevî ku hin xelk jî ber tirsa bêparbûn ji xizmetguzarîyên gund û bajaran, di hilbijartinan de beşdar dibin, lê dîsa jî asta beşdariyê li gora hejmara akinciyên navçeyên cuda yên Rojhilatê welat kêm e. Di hemû hilbijartinan de kurdên nêzîkî hikûmetê, soza bicîkirina mafên kurdan didin wan. Lê piştî hilbijartinê hemû tê jibîrkirin. Kincên kurdî, stran û çanda wan ji bo berjewendîya alîyê hikûmî tê bikaranîn. Kêmtirî 3 mehan ji bo hilbijartina serokkomariya Îranê maye. Lê dîsa jî serokkomar her weke berê ne dikare kurd be, ne belûç yan ereb û hwd. Yasaya bingehîn jî, ji berê ve mafekî nade kurdan û kesên ku di hilbijartinan de beşdar jî dibin, dizanin ku biryara herî dawî ne li cem serokkomar e, belkî li cem Elî Xamîneyî rêberê Komara Îslamî ye.

### Newroza girtiyên siyasî

Para herî zêde ya girtiyên siyasî li Îranê kurd in. Ew di dadgehên ser bi Wezareta Dadê ve têne darezandin. Hin girtî hene ku ev zêdetirî 25 salan in di girtîgehê de ne, bêyî ku karibin tenê carekê jî serdana malbatê bikin. Yasaya Komara Îslamî hemû rê li ber wan girtine. Li gora yasayên maf û kerametan, her kes li ber qanûnan wekhev in û ji parastina qanûnan bi awayekî yeksan xwedî mafê sûdwergirtinê ne. Hemû mirov li hemberî ciyawazî û her cure sepanên ku Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan îhlal dikin û bi navtêdanê han didin van kiryaran, xwedî mafê hêvîşaneke wekhev in. Li Îranê hin xalên yasaya bingehîn behsa serdana malbatê di Newrozê de dikin. Lê girtîyên siyasî wan xalan lixwe nagirin û nikarin Newrozê herin serdana malbatên xwe. Gelek ji girtîyên kurd bi tometa “şerê li dijî Xwedê” bi dar ve kirin, girtina sermedî (her timî) û hin jî bi dehan salan girtîgehê hatine cezakirin. Kesê ku bi tometa endametî di yek ji partîyên kurdî de hatibe girtin, her tim dikarê rewşên bi vî rengî dijwar û giran bijî.

Li gora benda duyem a Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, her kesek bêyî ku duçarî cudahîya ji ber nîjad, reng, zayend , ziman, ol, bawerîya siyasî yan jî yeke din jêbûna neteweyî an jî civakî, saman (serwet), zayîn an jî rewşeke din bibe, xwedî sûdwergirtina ji hemû maf û azadiyan ên ku di wê Danezanê de hatine ragihandin. Xala herî balkêş ev e ku divê ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî neyê kirin; te divê ev welat an herêm serbixwe an jî te divê ne xweser an jî te divê ne xweser an jî di bin rajêrîya tahdîda serwerîyekê de be. Lê kîjan kurd e li Rojhilat ku ew maf standibin û disa jî şer bike!

### Sizaya sedaredanê

Darvekirin jî bûye beşek ji jiyana xelkê li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê. Li gorî daxuyanîya Rêxistina Mafên Mirovan a li Îranê, di sala 2016an de li girtîgehên Îranê 530 kes hatine darvekirin. Hejmara kesên hatine darvekirin yên sala 2016an, li gorî sala 2015an, ji sedî 45 zêde bûye.

Berê Rêxistina Êfûyê ya Navneteweyî ragihandibû ku di sala 2015an li tevahiyê cîhanê 1634 kes hatine darvekirin û dabû zanîn ku di 25 salên dawî de herî zêde di 2015an de darvekirin pêk hatine. Li Îranê hejmara kesên ku di wê salê de hatibûn darvekirin 977 kes bûn. Sala 2016an ew hejmar dîsa zêde bû û 295 kes bi tometa bikaranîn û firotana madeyên heşbir hatine darvekirin, ji sedî 56ê kesên ku hatine darvekirin ev in. 33 kesên ji van, li ber çavên xelkê hatine darvekirin û di nav van kesan de 5 zarok hene. Rêxistina Mirovan a Îranê tekez kiriye ku 111 kes ji van kesên hatine darvekirin, li bajarên kurdan û bi eslê xwe kurd bûne.

### Zindanîkîrîn

Her roj ciwanên kurdan bi sedemên curbicur li Îranê tenê girtin. Medya jî qet nikare bi rengekî fermî û azadane nehsa wan bike. Ji ber ku veguhestina zanyarîyan jî qedexe ye. Tevî ku amareke rastîn tune ye, lê dîsa jî hejmara kesên ku bi tometên siyasî têne girtin yan rastî lêpirsînê tên, gelek e. Li gor birêvebirên sazîyên mafên mirovên rojhilatê Kurdistanê û Îranê, di 12 mehên paşiyê yên heya 19ê Adara 2016ê 12.000 kurd ji aliyê rêxistinên îstixbaratê ve yan bi biryara dozger hatine girtin, yan rastî lêpirsînê hatine yan jî di girtîgehan de ne. Ew hejmar di 2016an disa jî zedetir bûye.



Aliyên siyasî yên Rojhilat, herî dawî li ser pêşwazîkirina hevpar ya ji bo Newrozê li hev hatin. Belkî ev zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalîst û komonîst yên Rojhilatê Kurdistanê nêzîkî hevdu nebûbûn.






Karîkator ---------------------- Dijwar Ibrahim

## KOLBERÎ JÎ DERDÊ BÊDERMAN E

Her sal bi sedan kolberên kurd ji alîyê hêzên sersînor ên Îranê ve têne kuştin yan birîndarkirin. Ev yek di demekê de ye ku Elî Xamineyî, rêberê Komara Îslamî ferman dabû hêzên ewlehî teqeyê li kolberên kurd nekin. Serdozgerê Giştî yê Îranê jî gotibû, ew kesên ku li ser sînor kolberîyê dikin nabe rastî zor û êrîşê bên ji ber ku tekane çavkanîya jiyana wan kolberî ye. Wî behsa kolberên kurd ên ku li ser sînor bi piştan barberiyê dikin jî kiribû û gotibû ew kesên kolberîyê dikin divê hêsankarî ji wan re bê kirin û rastî zor û êrîşê neyên ji ber ku tekane çavkanîya jiyana wan kolberî ye. Li gora benda 25an a Danezana Cîhanî a Mafên Mirovan, xurek, cil û berg, xanî, xizmetên tenduristîyê û xizmetên civakî yên pêwîst jî di nav de mafê her mirovî heye ku bibe xwedî asta jiyaneke guncan a ku karibe gumrehî û tenduristîya wî û malbata wî pêk bîne. Her mirov ji ber rewşa bêkarî, nexweşî, seqetî, bîtî, pîr û kalitî an jî gava ku ji derfetê debarê bêyî hemd û vîna xwe bêpar bimîne û ji bo rewşên din , xwedî mafê ewlehîya civakî ne. Dê û zarok, pêştir û bi taybetî xwedî mafê pûtepêdayîn û alikarîyê ne. Hemû zarok, çi di dema zewacê de û çi jî li derveyî zewacê çê bûne divê ji heman ewlehîya civakî sûdê werbigirin. Lê kolber hene 70 salî û hene 13 salî. Kesek li mafên zarokan jî napirse û li mafên pîran jî napirse.

## Şengal:

# Kiryarên PKKê li dijî berjewendîyên kurdan in



Destêwerdanên PKKê yên li Şengalê bûye cihê nerazîbûnê. Nûnerên partîyên sîyasî, rewşenbîr û nivîskar amaje li ser wê yekê dikin ku hebûna PKKê ne di berjewendîyên kurdan de ye.



NÛJÎN ONEN

**HEWLDANÊN** PKKê yên destêwerdana siyasî û leşkerî li Herêma Kurdistanê berdewam dikin. Hefteya borî hêzên bi ser PKKê ve li Xanesora ser bi Şengalê ve di rê li ber Pêşmergeyên Roj girtin û êrîşî Pêşmergeyan kirin. Hêzên Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) ya bi ser PKKê ve ye amadekarîyên Pêşmergeyên Roj ên bo rizgarkirina hin herêmên Şengalê weke "gef" li ser xwe hesibandin û êrîşî Pêşmergeyên Roj kirin. Di encama şer de 4 şervanên PKKê jiyana xwe ji dest dan û gelek şervan û Pêşmerge jî birîndar bûn.

Piştî rûdana vê pevçûnê hin partî û rêxistin, siyasetmedarên bakur, başûr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê hebûna YBŞê ya li Şengalê wekî midaxeleyeke li hember karên navxweyî yê başûrê Kurdistanê şîrove kir û gotin, divê rêxistinên ku bi ser PKKê ve ne ji Şengalê derkevin.

Mîrê Êzdîyên Kurdistanê û cîhanê Mîr Tehsîn Beg li ser bûyera Şengalê daxwaz kir ku "Şer bê sekinandin." Serperiştyarê Enîya Şengalê Serbest Lezgîn piştî bûyerê daxuyanîyek dabû çapemeniyê û di wir de gotibû: "PKKê ji aliyê siyasetê ve îflas kiriye û ew nedikarin bihostek axê rizgar bike û biparêze. Ji bo Şengal rizgar bibe 600 Pêşmerge şehîd bûne û yek ji wan jî ne şengalî ne."

Siyasetmedar, rojnamevan û nivîskarên bakurê Kurdistanê pevçûna di navbera Pêşmergeyên Roj û YBŞê de rû daye ji heftenameya Basê re nirxandin.

**Nivîskar Şimşek: Îran dixwaze di ser Şengalê re here Derya Sipî**

Berî her tiştî divê mirov konjoktura dinyayê û herêmê analîz bike. Li herêmê hêzên navneteweyî hene, hêzên herêmê hene weke Îran û Tirkiyeyê, li herêma Şengalê hêzên din jî hene, berjewendîyên gelek aliyan li vir hene. Kurd divê berjewendîyên herêmê û navneteweyî baş analîz bikin. Îran naxwaze Şengal bi ser Kurdistanê ve be. Mesele ne meseleya di nav kurdan de ye, berjewendîyên Îranê û Tirkiye li wir hene. Îran dixwaze ji ser Şengalê û Rojava biçe ser Deryaya Sipî. Îran bi rêya rêxistinan siyaseta xwe dimeşîne, bo nimûne dixwaze di nav kurdan de jî rêxistineke wan hebe. Îran naxwaze başûrê Kurdistanê serbixwe be lê xuya ye Ebadî rê dide tişteki wisa lê Îran rêya wan jî digire.

**Nivîskar Güçlü: Divê PKK ji başurê Kurdistanê derkeve**

Siyasetmedar û nivîskar İbrahim Güçlü hebûna hêzên PKKê yên li Şengalê wiha şîrove dike: "Pirsgirêka PKKê li başurê Kurdistanê ne tenê meseleya Şengalê ye, pirsgirêka PKKê pirsgirêkeke tarîxî ye. PKK gelek vekirî dibêje ez ê li başurê Kurdistanê desthilatdar bim. Loma heger meseleya PKKê li Şengalê dest pê bike ne pirsgirêkek e ku neyê çareserkirin. Li Şengalê îro şerê Îran, Iraq û Surîyê ye ku bi awayekî wekaletî bi rêya PKKê li hemberî desthilatdarîya başûrê Kurdistanê didome. Sedemên wê yên girîng hene yek jê Îran naxwaze herêma Kurdistanê hikumran be, heger hikumran be avakirina dewletê rehettir e."

**Rojnameger Işık: Hêzên kurd dikarin bi dîyalogê meseleyan çareser bikin**

Şerekî navxweyî ya kurdan ti carî di berjewendîya kurdan de nîne. Mixabin di meseleya Şengalê de destêwerdan heye. Welatê kurdan hatiye perçekirin. Li her perçeyekî, desthilatdar û dagirkerek heye. Mixabin her beşek li hember beşên din kurdê xwe bi rengekî bi kar tîne. Di dîrokê de ev gelek caran hatiye dîtin. Ji ber vê yekê jî hin caran şerên navxweyî û birakujî derketine. Meseleya Şengalê jî ji vê rewşê cûdatir nabînim.

Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) û Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) ji şengalîyan cûdatir nabînim. Ew beşeke ji Şengalîyan e. Belê, meseleya hebûna HPGê bi rengekî dibe cîhê gengeşîyê, lê divê neyê jibîrkirin ku di parastin û azadkirina Şengalê de para wan jî heye. Lê tiştê tê dîtin, ew ên ku niha di parastina Şengalê de wezîfe girtine şengalî ne, êzîdî ne û li wir ji bo parastina Şengalê bi navê YBŞ û YJŞ hêz amade kirine.

Divê kurd ji lîstokên dewletên herêmê hayîdar bin. Di qada navneteweyî de hevdunegirtina kurdan pirsgirêka herî mezin e. Îro li rojavayê Kurdistanê yên li hember DAIŞê şerê herî mezin didin kurd in. Li başûrê Kurdistanê heta ku Pêşmerge li hember DAIŞê şer nekiribû, hêzên Iraqî nedikarî bûn li Mûsilê bihustekî pêşde biçin. Divê partiyên me yên siyasî bi taybetî jî partiyên me yên çekdar yên xurt, bi rengekî vê meseleyê çareser bikin.

**Nivîskar Eser: Derdê wan têkbirina serxwebûna Kurdistanê ye**

Dijminên me gelekî bi hêz in, hêzên wan jî di nava kurdan gelek e, divê berî her tiştî em vê tehlîl bikin, em vegerin ser şîroveya milletê xwe û azadiya wî, em ê bibînin ku problemên me ji ku tên. Bi salan e, piştî Kurdistan bû du parçe û heta îro kurd her li bende hinek ronahîyan bûn ku çenek azadî bibînin. Wek milletekî li dinyê nifûsa wî herî pir e lê bê dewlet e. Piştî salên 1992an azadiya başûrê Kurdistanê bi dest ket û pê ve ew azadî hêdî hêdî roniya xwe da şevreşên tarî yê perçeyên din. Azadiya milletekî bi sebr, bi gavên rast û baş divê bê bidestxistin.

Dijminê me di nav xwe de bi salan e hin kurd perwerde kirine da ku rojekê azadiya Kurdistanê bê holê, wan bikin asteng da ku azadiya Kurdistanê pêk neyê.

PKK dibêje me Şengal azad kiriye, heke tu rêxistineke xurt, kurd û kurdistanî ye qada xebata te bakurê Kurdistanê ye. Te bakurê Kurdistanê wêran kir, partiyên siyasî yên ku kar dikirin hemû têk birin. Li bakurê Kurdistanê yek gund xelas nekirin, îcar çawa diçin perçeyê din ku wê derê azad bikin. Helbet Kurdistan yek parçe ye lê piştî perçebûna Kurdistanê heta roja îro her perçeyekî kulturek girtiye. Ti mafê rêxistineke bakurê Kurdistanê tune ye biçe wir midaxaleyî karên wir bike û şer bike. Lê şerê wan ne ji bo azadiya birayê wan e, şerê wan ji bo têkbirina wê derê ye.

Eser li ser Melle Mistefa Barzanî mînakekê dide û gotinên xwe wiha bi dawî tîne: "Wek mînak Barzaniyê Nemir çû Mahabadê alîkariya birayê xwe kir got, hûn çi dixwazin ez di emrê we de me, piştî karê wan qediya bi Pêşmergeyên xwe re vegeriya cîhê xwe. Em îro dibînin ku Kurdistan ber bi serxwebûnê ve diçe lê ev nayê hesabê PKKê û hemû rêxistinên bi wê ve girêdayî. Ev hewldan ev şer ne şerê Şengalê ye derdê wan ew e ku serxwebûna Kurdistanê têk bibin."



Fehim Işık



Şahidin Şimşek



İbrahim Güçlü

## Dewleta kurdî çima daxwaz û pêdiviyeke navdewletî ye?



DR.ZARA SALIH

Bêguman ew xewna kurdî bi damezrandina welatekî serbixwe bûye rastiyek di vê çarçewê de, ji bilî ku bêtirî bîst salan e Herêma Kurdistanê xwe bixwe rêveberîyê dike. Hemû şert û mercên dewleta serbixwe peyda dibin ta wê radeyê em karin bibêjin bi şêweyekî fermî jî. Serokatiya herêmê birêz Barzanî tê vexwendin ji aliyê piraniya welatên cîhanê mîna serokê dewleteke, û gava ku serdana Iraqê tê kirin pêşî tên Kurdistanê berî herin Bexdayê. Tev wê jî, bi dehan balyozxane û qonsulxanên navdewletî li Hewlêra paytext hene ku ev tê wateya pejirandineke fermî ya bi vê herêmê re weke dewleteke serbixwe.

Helbet projeya guhertinên stratejîk li Rojhilata Navîn diyar e û plan bi rê ve diçe di vê derbarê de. Kurd jî beşekî sereke ne di van bûyeran de, nemaze piştî serkeftinên balkêş ên Pêşmergeyên Kurdistanê li dijî DAIŞ û hêzên îslamî.

Gelek çavdêrên siyasî û navendên stratejîk vê rastîyê diyar dikin û tekez dikin ku yek ji faktorên sereke di vê projeyê de helbet kurd in û plana avakirina dewleta kurdî ye. Lewra ev dîtin û xwendin ji aliyê hin kesayetiyên herêmî û ereb ve jî derdikevin. Nivîskar û siyasetmedarê Urdinî (Salih Al- Qalap) di axaftina xwe ya dawî de tekez dike "Pêwîst e ku ereb piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bikin û bi çavê gumanê lê mêze nekin, ji ber ku dema mafên kurdî yên rewa nêzîk bûye ji dewleta serbixwe... "gelek caran jî wî gotiye ku divê piştevaniya kurdan bibe û em weke ereb di wê baweriyê de bin ku cîranê me yê nû, weke dewlet wê kurd bin. Ji ber ku (li gor helwesta wî) ev rê stratejiya herî baş e ta projeya Îranî bê rawestandin.

Tîşta herî giring di vê derbarê de ew e ku di vê "cenga cîhanî " ya li dijî têrorê de, îro kurd di serê rimê de berevaniyê di ber hemû cîhanê de dikin.

Hêjayî gotinê ye ku îro roj berjewendiyên me kurdan û yên hevpeymana navdewletî li hev rast hatine, nemaze di biwara şerê têrorê de û projeya guhertinê de. Xuya bû ku dewletên mezin xwedî biryar in ku kurd û hêzên wan ên leşkerî, mîna Pêşmergeyan, hevalbendên cihê baweriyê ne nexasim piştî şikandina DAIŞ li Başûr û Rojavayê Kurdistanê.

Wekî din nimûna Herêma Kurdistanê eşkere kir ku kurd dûrî raman û îdeolojiya teng û tundûtujiyê ne, ew bêtir demokrasî ne, xwedîyê mêjiyekî vekirî ne û mafên hemû pêkhateyên di nava xwe de diparêzin.

Tîşta herî giring di vê derbarê de ew e ku di vê "cenga cîhanî " ya li dijî têrorê de, îro kurd di serê rimê de berevaniyê di ber hemû cîhanê de dikin. Ev, helbet bandora wê erênî ye ku êdî welatên weke Amerîka û Ewropayê berjewendiyên xwe yên stratejîk biparêzin bi hebûna dewleta kurdî, ta karibin balansê û aramiyê peyda bikin li Rojhilata Navîn. Sedemên van xalên giring wê bibe dûpatkirina avakirina Kurdistana serbixwe ta karibin plana xwe bi dawî bikin.

Helbet rola serokatiya Herêma Kurdistanê û siyaseta wê di vir de gelekî bi zîrekî bi rêvebirin ta gihan vê qonaxê û bi cîhanê dan nasîn, name û daxwaza neteweyî yên kurdî, digel hemû astengiyên li herêmê.

Nêzîk e Kurdistana serbixwe wê nexşeya cîhanê bixemilîne û bila bê zanîn ku dewleta ku sînorên xwe bi xwîna şehîdan av daye wê bibe cîranê aştîxwaz ji ereb, tirk û farisan re; ev rastiya herî diyar e.



## HOŞENG OSÊ

### PKK kengî û çawa û çima bû "Apocî"?

Gelo ji PKKê ya ku di sala 1978an de hate damezerandin çi maye? Bi gotineke din: Çi ji hîm û pirensîb û armancên ku PKKê li ser wan hatiye avakirin mane? "Xweseriya demokratîk" ketiye şûna "Kurdistana serbixwe û azad û yekbûyî"

Ne tenê wisa jî, êdî PKK şerê yek ji pirensîbên xwe yên damezirandinê dike, ew jî dewleta neteweyî ye! Berî niha, PKKê digot: "Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştek nîne" û ev dirûşm kir "logo"ya rojnama xwe ya navendî û fermî "Serxwebûn" û li gorî rewş û rojeva ku PKK tê de ye û hingî şerê serxwebûna Kurdistanê dike û pesnê "xweseriya demokratîk" ya xwe dike, mirov dibeje; hewce ye PKK navê rojnameya xwe ji "Serxwebûn" biguhere û bike "xweserî" û logoya wê bike: "Ji xweseriya demokratîk birûmetir tiştek nîne."

Baş e, neteweperwebûna PKKê ji "Serxwebûnê" daket "xweseriyê –otonom/ xudmuxtarî/ rêvebirina herêmî" û ji sosyalîzmê û dijatiya emperyalîzmê û DYAyê daket çawa "bi kotekî û heftê bela" xwe bi rojava (DYA-YE) xwerazî û şêrîn bike û çekan wergire û ji dêvla Amerîkayê şerê DAIŞê bike! Û PKK weke partiyeke çepgir û laîk xwe hesab dike di salên 90î de û niha jî bi rêjîmeke kevneperest, olperest, tayîfeperest weke bi rêjîma Îran re di nava hevkarî û peywendiyan de ye! Pê ve girêdayî ye PKK weke partiyeka azadîxwaz, şoreşger, dermoraktxwaz di salan 80î û 90î de û niha jî bi rêjîmeke dîktator, hov û malbatperest weke rêjîma BAAS bi Sûrîyê re di hevkarî û peywendiyan de ye. Helbet ev hevkarî û peywendî bi rêjîmên Tehran û Şamê re dê li ser hesabê doz û mafên gelên kurd li van herdû welatan be. Ocalanê ku dema li Şamê bû, rexneyên tund li M. K. Atatürk û li Kamalîzmê dikir, lê çûna Ocalanê li İmralı destê Ataturk ji xwîna kurdan dişo û dibêje "Ataturk ne dijminê gelê kurd e" Baş e, li gorî vê rewş û rojev û dîrokê, çiqas rast û di cih de ye eger em PKKê weke tevgereke rizgariya neteweyî binirxînin û bipejrînin?!

Em vê mijarê deynin aliyekî û berê xwe bidin mijara sereke ya vê gotarê: PKK kengî û çawa û çima bû "Apocî"?! Rast e millet, rêxistin û gelek alî û derûdoran PKK bi navê "Apocî/ Apocu" nasdikirin lê çapemenî û rojname û belgeyên kongire û konferansên vê partiyê ji sala 1978an û ta salên 1998an ango di 20 salan de navê "Apocî" li ser xwe qebûl nedikirin. Tev li wisa jî PKKê nedikarî di nava gel de vî navî ji ser xwe rake.

Sedema lidijderketina PKKê ya li hember vî navî "Apocî" mirov dikare ji damezirînerekî rêxistênê Mazlum Dogan nas bike. Ji ber ku rojnameya fermî û navendî ya PKKê "Serxwebûn" di hijmara xwe ya 6ê Hezîrana 1982an de, di rûpela 21ê de lêpirsîna endamê komîteya navendî û berpirsê weşan û ragihandinê M. Dogan, di dadgehê de belav kiriye. Derbarê navê rêxistinê de û li gorî "Serxwebûnê" Dogan wisa dibêje, "Bi gelemperî, tevger di alema giştî ya Tirkiyê de ji hêla weşanên resmî ve, ji hêla rojnameyan ve bi navê "Apocular" hatiye danasîn. Di nav gel de ji bilî me, ji hêla hin komen çepên Tirkiyê û ji hêla hin tevgerên burjûweyê milletên Kurdistanê ve em wisa têne binavkirin. Lê meriv organîzasyonekê siyasî bi navê kesekî bi nav bike ne tiştekî rast e. Ji ber ku heqîqet jî ne wisa ye. Navê wê li ser wê ye. Partiyek e û navê wê Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Gotina "Apocular" an jî "Apocî" hê bêtir ji hêla burjûweyên milletê kurd ve hatiye bikaranîn. Li ber vê qestê, ji talîmkirina gelê Kurdistanê gundî ji ev wisa hatiye binavkirin......".

Lê ji sala 1999an û ta nuha hemû berpirsên PKKê di gelek nivîs û daxûyaniyên xwe de êdî navê tevgera weke "Apocî- Apocular" bi kar tînin. Weke mînak; di rûpelê 15an ji hijmara 207 Adara 1999an ya rojnameya "Serxwebûn"ê de ev manşetê bi kar aniye: "NEWROZ'DA BAŞLAYAN "ÖNDERLİK YILI"NDA VI. KONGRE GERÇEĞİMİZİ APOCU SAVAŞ VE ÖRGÜT TARZIYLA HAYATA GEÇİRELİM" (Di "sala serokatîyê" ku di newrozê de dest pê kir, em rastiya xwe ya kongreyê bi şêwaza şer û rêxistiniya Apocî geş bikin) (http://serxwebun.org/arsiv/207/). Ji wê hejmarê û ta hemû hejmarên 2016an, bi dehan nivîs û nûçe hene ku vî navî bi kar tînin. Ev yek ji bilî "Serxwebûnê" di gelek saziyên din yên medya û ragihandina PKKê de peyda dibe. Êdî alîgirên PKKê di xwepêşandanan de, helbesta Cegerxwîn "Kîme Ez" ku Şivan Perwer kir stran, weke "Kîne Em" werdigerînin û bang dikin: "Kîne em?" "Apocî ne."

Li gorî vê rewşê, yan M. Doğan di redkirina navê "Apocî" de şaş bû û berpirsên PKKê yên anuha rast in? Yan jî Doğan rast e û PKK aniha şaş e. Ji ber ku bi rastî, navê "Apocu/ Apocî" navî gundiyên, ji bilî ku "çî" verdigere zimanê tirkî.

Li gorî nêrîna min destpêka girêdana rêxistinê bi kesayetiya Apo-Ocalan re di kongreya 1982an de dest pê kir. Ji ber ku gelek ji damezirînerên PKKê di zindanê de bûn: K. Pîr, M. Doğan, X. Durmuş, M. Şener, S. Cansiz, Ş. Dunmez, Y. Merkît. F. Kurtay, M. Karasu... hwd. Jixwe piştî kuştina Semîr (Ç. Gungur) û kongreya PKKê ya sêyem, di sala 1986an de ev hewldan xurtir bû. Û di salên 90î de hîna bêtir. Lê di fermîyetê de berpirsên PKKê navê "Apocî" di nivîsên xwe de bi kar nedianîn.

Niha pir rihet û normal, weke qurteke av, ev nav ji aliyê payebilindên PKKê ve tê hildan û êdî qet nayê bîra dost û berpirsên PKKê ku rojekê ji rojan û li pêşiya dozgerê dadgehê, M. Doğan û hemû hevalên wî yên zindanê ev nav qebûl nedikirin û ew bi tundî rexne dikirin



# Reqqa dê bo kê bibe serkeftin?



DERYA KILIÇ

**HÊZÊN** Sûriya Demokratîk (HSD) ku ji sedî 70 ji YPGê pêk tên, operasyona Reqqayê didomîne; ji aliyên din vê jî Tirkiyê li ser Dewletên Yekbûyi yên Amerîkayê (DYA) zextan dike ku ji şûna YPGê ew beşdarî operasyona Reqqayê bibe. Lê li gor analistan rûdanên dawi yên li Minbîc û helwesta DYAyê dide xuya kirin ku DYAdê bi HSDê operasyona Reqqayê berdewam bike. Jiber ku helwesta DYAyê ya li Minbîcê weke nişankirina hevalbendîyê û hilbijartina YPGê tê nirxandin.

Herwiha aliyê siyasî yê DYAyê bi awayekî fermî neragihandibe jî PENTAGONê careke din bi awayekî aşkerê destnîşan kir ku ew dê ligel HSDê operasyona Reqqayê pêk bînin. Li gor nûçeya CNN Internationalê du rayedarên DYAyê diyar kirine ku 300 leşkerên wê bi çekên giran gihaştine bakurê Sûriyê ku ji Reqqayê 25 km dûr e û 1000 hezar leşkerên xwe yên din jî dê bişîne Quweytê. Analistan piştî kiryara DYAyê aşkere kirin ku di demeke nêzik de li navenda parêzgeha Reqqayê şer dest pê bike. Jiber ku heman

> Nûnerên Tirkîye jî aşkere dikin ku dê ew jî beşdar bin di operasyona Reqqayê de. Herweha bi minasebeta qeyrana Sûrîyê serfermandarên Amerîka, Tirkîyê û Rûsyayê li bajarê Antalyayê civîyan.

> Rojeva hêzên herêmî û navdewletî operasyona Reqqayê ye. HSD aşkere dike ku ew dê di demeke nêzîk de bajêr derpêç bikin. Herweha PENTAGONê bo HSDê çek, teqemenî û leşker şandin Rojavayê Kurdistanê.




taktîkên Mûsilê li wê derê jî tên bi kar anîn.

Herwiha Berdevkê Demkî yê Wezareta Derve yê DYAyê Mark Toner di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de got: "Demeke dirêj e YPG ku di nav HSDê de cih digrin, em piştevaniya wê dikin. Ew ji bo êrîşên li dijî DAIŞê û tinekirina DAIŞ gelek bi bandor û bihêz e. Ji 4 Mijdarê heta niha 6 km û 100 gund ji destê DAIŞê rizgar kirin."

Dema ku ev rûdan pêk dihatin HSDê jî di nav xwe de civîn li dar xistibû. Berdevka Operasyona Xezaba Feratê Cihan Şêx Ehmed ji ber ku ev tiştên leşkerî nê zêde zanyari neda. Lê ji heftenameya Basê re ragihand ku ew li ser van mijaran û Reqqayê civînan çê dikin û nikarin derbarê naverokê de zanyariyan bidin.

Cîhan Şêx Ehmed ji Reutersê re jî derbarê Operasyona Reqqayê de axivî û wisa got: "Bi beşdarbûna xelkên herêmê hejmara hêzên me zêde dibin. Bi piştevaniya Hevpeymanê hêzên em dikarin Reqqayê rizgar bikin. DAIŞ di nava kolanan de hendekan dikolin. Wisa xuya ye ku dê şerên kolanan pêk bên."

**Fermandarên Rûsya, DYA û Tirkiyê biryara çi da?**

Ji ber Minbîcê navbera Tirkiyê û DYAyê baş nebû. Ji ber vê, hevdîtineka dîrokî li Antalyayê parêzgeha Tirkiyê pêk hat. Serfermandarê Tirkiyê Hulusi Akar, Serfermandarê DYAyê Joseph Francis Dunford û Serfermandarê Rûsyayê Valery Vasilyeviç Gerasimov roja sêşemî derbarê Sûriyê û Iraqê de civayan. Piştî civînê bi daxuyanîyan zanyari nehatibê dayin jî, mijar Reqqa, Minbic û Sûriyê bûn. Piştî vê civînê rayedarên Tirkiyê li dijî DYAyê nerazîbûnên xwe nişan dan. Ji ber ku di vê demê de Pentagon destnişaniya aliyên xwe kiribû.

Lê li gor pisporan Rûsya di navbera Tirkiyê û DYAyê de navbeynkari kiriye. Tirkiyê jî nerazîbûna xwe derbiribû.

**Rêya Reqqa û Mûsil hat qut kirin**

Li alîyê din dema ku ev rûdan pêk dihatin,  HSDê jî pêş ketina xwe ya Reqqayê berdewam dikir. Operasyona Reqqayê di qonaxa yekemîn de ji aliyê rojava û bakurê Reqqayê ve dest pê kir û di merhalaya duyem de jî li rojhilatê hatibû dest pê kirin. Di meha Sibatê de qonaxa seyem dest pê kir û di vê çarçoweyê Deyre Zor hatibû bi dest xistin û bi vî awayî rêya DAIŞê ya Mûsil û Reqqayê hat qut kirin. HSD bi Deyrez Zorê ji sê aliyan parêzgeha Reqqayê dorpêç kir û ev jibo rizgarkirina Mûsil û Reqqayê û lawazkirina DAIŞê weke serkeftineka baş tê nirxandin.

Vêkolinerê SETAyê Can Acun operasyona Reqqa û helwesta DYAyê ji heftenameya Basê re nirxand.

Vêkolinerê SETAyê Can Acun: Tirkiyê tevî DYA û Rûsyayê dê vê têkoşîna xwe bidomîne

Vêkolîner Can Acun operasyona Reqqayê û beşdarbûna YPGê nirxand û diyar kir ku demake dirêj e Tirkiyê dixwaze li ser polîtîkayên Sûriyê bi DYAyê re li hev bike. Lê di serdema rêveberiya Obama di vê mijarê de ti serkeftinek nehat bi dest xistin. Di serdema Trump de careke din vê hewlê dest pê kir. Lê em dîbinin ku polîtîkayên Tirkiyê û DYAyê derbarê Sûriyê de wekehev nîn in.  Tevî hesasiyet û hişyariyên Tirkiyê, Pentagon û CENTCOM piştevaniya xwe ya PYD/YPGê didomîne û DYA jibo Reqqayê dev ji Tirkiyê berda û YPG hilbijart. Acun derbarê vê mijarê de wisa domand: "Ez difikirim ku Tirkiyê tevî DYA û Rûsyayê dê vê têkoşîna xwe bidomîne û armanca xwe ya Minbîcê pêk bîne."

Can Acun li ser armanca PYD/YPGê jî rawestiya û da zanîn ku armanca serekeya PYD/YPGê ev e; herêmên di destê vê de ne, bigihinin hevdu û li aliyê sînorê Tirkiyê xetekê ava bike. Niha bi alîkariya DYAyê diçin Reqqayê. PYD îdia dike ku li Minbîcê ti hêzên wan tune û Meclîsa Leşkerî ya Minbîcê parastina herêmê dike. Heger wisa be, wê çaxe divêt di navbera êrîşa Minbîc û Reqqayê de ti eleqe tune be.

## PIŞTÎ ŞENGALÊ ÊRÎŞÊN PYD YÊN LI DIJÎ ENKSÊ ZÊDE BÛN

Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) û Peşmergeyên Rojava di 3 Adarê de li Şengalê şer kirin. Piştî vê rûdanê zext û êrişên PYD û asayişa wê ya li Rojavayê zêde bû. Şaxên Partiya Yekîtiya Kurd (PYKS) û Partiya Demokratîk a Kurdistana Sûriyê (PDK-S) li Qamişloyê rastî êrişan hatin. Endamê Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê (PDPK-S) Şemdîn Nebî ji aliyê Asayişê ve hat desteserkirin.

"PYD bi plana Îran û Sûriyê hatiye Kurdistana Sûriyê"

Ligor zanyariyên ku endamên ENKSê dane, kesên ku êrişî wan kirine, heqaret li Ala Kurdistanê kirine û şaxên wan şewitandine.  Endamê ENKSê Kawa Ezizî ev hemû kiryarên PYDê jibo rojnameya Basê nirxand û diyar kir ku PYD piştî Şengalê êrişên xwe yên lidijî ENKSê zêde kirine. Ezizî axaftina xwe wisa domad: "PYD bi plana Îran û Sûriyê hatiye Kurdistana Sûriyê. Îran dixwaze rejim kontrola vê herêmê bi dest bixe û bipareze û nehêle kurdên Sûriyê tiştekî neteweyî bikin. Îro ev karên ku PYD dike, karên dijminatiyê ye. Ti hevalbendî û alîkarî jibo Kurdistana Sûriyê nekiriye û wê derê dagir kiriye. Diziya xelkê dike û bajar dide ser xelkê."

Ezizî kiryarên PYD lidijî kurdbûn û kurdiyatiyê nirxand û da zanîn ku hemû karên wê ne jibo mesleheta kurdî ye û bi navê kurdî şerê habûna kurdan dike.

Kawa Ezizî bal kişand ser helwêsta ENKSê û aşkere kir ku ENKS bi aştiyane tevdigere û muqavamet dike û ew jî hevalên me digirin û biroyên me dişewitinin.

Herwiha Ezizî derbarê gel de jî wisa got: "Gel jiber tirsê nikare dengê xwe derxine. Jiber ku bi çekan zextê liser gel dikin. Millet êdî baweriya xwe bi wan nîne."

## Rojavayê Kurdistanê:

# Gelo kurdan fersenda xweserîyê ji dest da?

Hemû alî gengeşîyê li ser wê yeke dikin ku gelo pêşmerge dê derbasî Rojava bibin an nebin? Lê li gorî min pirsa girîng ew e ku dema pêşmerge derbasî Rojava bibin, bernameya wan dê çi be? Gelo pêşmerge here Rojava wê bikare çi bike û çi derfetan berdest bike ji bo kurdan?



■ ŞOREŞ SERBEST

**SEROKÊ** Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di hevpeyvîna xwe ya bi rojnameya Îtalî "La Stampa" re qala rojavayê Kurdistanê dike û dibejê ku fersenda xweserîyê li rojavayê Kurdistanê ji dest çûye. Hin kes dikarin bibejin ku a niha beşeke herî zor a Rojavayê Kurdistanê hê jî di destê PKKê de ye. Pirsa Sûrîyê nehatiye çareser kirin û hê jî derfet heye ku li Rojava xweserî were avakirin. Li vê derê pirseke bi du bersivan tê pêşîya me. Gelo li gorî we xweserî çi ye? Xweserî ew e ku kurd li wan herêmên ku nifûsa wan zêde ye, bi rêya şaredarî û mafên çandî desthilateke herêmî bin? Yan xweserî ew e ku kurd li ser axa yekgirtî ya Rojavayê Kurdistanê deshilat bin? Pêwîstî ev e ku em bersiva van pirsan bidin. Eger hat û derdê me bes ew be ku em bi rêya şaredarî û hinek dezgehên hukmî xwedî desthilateke nîvçe bin; rast e, ew fersenda hanê me hê ji dest nedaye. Lê eger derdê me ew be ku em wekî başûrê Kurdistanê axeke yekgirtî û desthilateke giştî ava bikin; erê, me ew fersend ji dest daye.

Me çima ev fersend ji dest daye, ka em hinekî lê binêrin û li xwe vegerin. Di destpêka şoreşa Sûrîyê de, heke kurdan bi awayekî yekdengî û hevgirtî bernameyek danîbûya ber xwe û ew neketibûna pêşbirka desthilatê, ez bawer im ku îro me qala van tiştan nedikir. Lê mixabin, me ev yek nekir. PKKê ji xwe re bernameyek danîye an jî îdeolojîyek çêkirîye. Û mixabin, PKKê, destkevtên kurdan ji bo ceribandina fikra xwe kir wekî labaratûwarekê, li Rojavayê Kurdistanê ev destkevt cerribandin û ev cerribandin didome. Dema bi navbeynkarîya Birêz Barzanî her du alî, ENKS û TEV-DEM, li Hewlêrê hatin bal hevdu û qaşo rêkeftinek wajo kirin; me hemûyan dile xwe xweş kir. Lê mixabin piştî ku TEV-DEM vegerîya, wê ev peyman ji bîr kir û yek xal û bend jî bi cî neanî.

Dîsa bi navbendiya Birêz Barzanî û vê carê bi piştgiriya Amerîkayê, her du alîyên kurdan li Duhokê kom bûn û careke dî li hev kirin. Lê vê carê jî ew peyman nehate bicihkirin. Di meseleya vê peymanê de, li gor min, TEV-DEM tawanbar e. Ji ber ku ew li Rojava xwedîyê desthilatê ye û pêwîst e ev desthilat ji bo bicîanîna xalên peymanê kar bi kar bianîya û zemîn xweş bikira. Lê TEV-DEMê li Hewlêr û Duhokê peyman wajo kir û mixabin bi cî neanî. Ne ku tenê bi cî neanî: piştî wê, ji xeynî alîyên kurdî bi hemû alîyan re rûnişt û peyman wajo kir. Ew cîhên ku bi xwîna kurdan hatibûn azadkirin, radestî hin alîyên din kir. Herî dawî beşek ji Minbîcê radestî rejîma Esed kir ku ev radestkirin ne bi dilê Amerîkayê bû. Dîmen jî hatin belavkirin ku Artêşa Amerîkayê bi fermî, bi alayên xwe ket Minbîcê û şanî Rûsya û Esed da ku rêkeftina PKKê çi wateya xwe tune ye û xwedîyê Minbîcê Amerîka ye. Ji xwe piştî ku hêzên Amerîkayê bi alayên xwe derbas bûn, pêşveçûn an jî radestkirina Minbîcê hate sekinandin.

Yek ji wan egera ew e ku hêzên dagirker ên Tirkiyeyê, derbasî axa Rojavayê welêt bû û beşek jê dagir kir. Û eşkere ye ku PKK nikare li Rojava şerê Tirkiyê bike. Pêwîst bû PKK li qada şer bêdengiyê hilbijêre û jixwe weha jî kir. Tirkiye nehişt korîdora kurdan ava bibe û rê li ber yekparebûna Rojava girt. Esad bi fermî û bi rêdana PKKê hat û kete wan deran ku wê bibûna rê ji bo avakirina korîdora kurdan.

Dewleta Tirkiyê bi dehan caran got: "Ew tiştê li Bakurê Iraqê rû da, em nahêlin li Sûrîyê rû bide." Lê me kurdan ev yek fêm nekir. Desthilata Rojava gelek caran bi awayekî fermî û bi livûtevgerên xwe nîşan da ku wan çi mebestek tune ye ku ew li Rojava pergaleke neteweyî an Kurdistanî ava bikin. Di kongreya xwe ya herî dawî de navê rojavayê Kurdistanê kirin "Bakurê Sûrîyê" û bi vê biryarê bi fermî ji me re eşkere kirin ku ew tu carî hewlekê nadin ku mafên kurdan ên neteweyî werin parastin. Gelo em vê pirsê çima ji xwe nakin?

**Haşdî Şabî derbasî Qamişlo bû**

Çima Haşdî Şabî ya Iraqê derbasî Qamişlo bû? Çi karê Haşdî Şabî ango DAIŞa şîe li Qamişloyê heye? Haşdî Şabî bi çi bazarê dihere û li Rojava bi cîh dibe. Îran an jî Iraqê çi da PKKê ku PKKê derî ji wan re vekir? Ew deriyê ku li Pêşmerge hatîye girtin. Gelo mebesta çûna Haşdî Şabî rêxweşkirin û amadekarî ye ji bo avakirina hîlala şîe? Maneya vê yekê ew e ku korîdora şîe berdêla korîdora kurdî ye. Gelo PKKê ji bo erêkirina korîdora şîe çi ji Îranê stendiye? Çima dernakeve ji gel re eşkere nake ku çima hemû hêzên şîe li Rojava bi cîh dibin?

Ez naxwazim qala wan siviktîyên PKKê bikim ku bi alaya neteweyî ya kurdan kiriye. Wan bikim delil ji bo dijberiya PKKê ku li himber nîşan û sembolên neteweyî yên kurdan e. Jixwe hemû kurd bi rêya ragehandinê van siviktiyan dibînin û dixwînin. Ya li serê min nivîsî ew e ku bir fermî derek tune ye bi navê Rojavayê Kurdistanê, lê desthilatek ava bûye bi navê "Bakurê Sûrîyê". Ev tişt delîla herî mezin û nişaneyeke berçav e bê me çima fersenda xweserîyê ji dest daye û bê çima Barzanî vê daxuyaniyê dide.

Baş e, ma çima xeletiyên Serok Barzanî ango rêveberiya Başûrê Kurdistanê tune ye ku îro navê rojavayê Kurdistanê bûye "Bakurê Sûrîyê"? Belê, bêguman heye û li gor min ev yek xeletiya herî mezin a Herêma Kurdistanê ye. Ji ber ku di destpêka şerê Sûrîyê de, wê dikarî bilez hêzekê amade bike û wan deran kontrol bike. Piştre xebatê bikin ku berê kurdan li Deryaya Sipî be û derîyê cîhanê bi rêya Rojava li her çar perçeyê Kurdistanê vekin. Lê mixabin Herêma Kurdistanê ev yek nekir, yan jî pir dereng man ku vê erka neteweyî bi encam bikin.

Bi dîtina min, Başûr û Serok Barzanî xwestin ku vî karî bi rêya PKKê ango PYDê bi encam bikin. Wan bi vê mebestê hewl da. Lê tiştê min fam nekir ev bû ku wan çima ev tişt bi hêza xwe nekir û xwest bi hêza PKKê vî karî bikin. Ev kar çima bi vî rengî bi encam bû û rê li ber vebû ku Rojava ji dest kurdan here. Îro Pêşmergeyên Rojê di rojevê de ne û tê ragehandin ku ew dê derbasî Rojava bibin. Herhewa ENKSê li Koşka Sipî bi rayedarên Amerikî re hevditin kir û li gor daxuyaniyên wan mijara sereke ya hevdîtinê derbasbûna pêşmerge ye.



## DERBASBÛNA PÊŞMERGEYÊN ROJÊ

Hemû alî gengeşîyê li ser wê yeke dikin ku gelo pêşmerge dê derbasî Rojava bibin an nebin? Lê li gorî min pirsa girîng ew e ku dema pêşmerge derbasî Rojava bibin, bernameya wan dê çi be? Gelo pêşmerge here Rojava wê bikare çi bike û çi derfetan berdest bike ji bo kurdan? Pêşmerge dê bikaribin bikevin Cerablûsê, yan wê bikaribin navbera Efrîn û Kobanê bi dest bixin? Pêşmerge dê bikaribin rê vekin, berê xwe bidin Deryaya Sipî û kurdan ji bêderwazebûna cîhanî rizgar bikin? Bêguman gava pêşmerge derbas bibe hevsengî dê were guhertin û wê hin alî mecbûr bimînin ku vegerin ser navê Rojavayê Kurdistanê. Lê ya herî girîng ew e ku piştî ewqas hêz bikeve Rojava û yekparçeyiya axa Rojava nemine; pêşmerge dê karibe van hêzan gişan ji Rojava derxîne da ku bi tenê pêşmerge û YPG bimine li ser axa Kurdistanê? Pirsên girîng ev in û heta niha tu kesî bersiva van pirsan nedaye.

Hêvîdar im ku pêvajo biguhere û rojavayê Kurdistanê jî wek Başûr bibe xwedî desthilat li ser axa yekpare ya Rojavayê Kurdistanê. Ji bîr nekin, heke ax ne yekparçe be tu ne desthilatdarê wê yî.



JAN DOST

## Derdê duzimanîyê

> Me got divê mirov "zimanê dijmin" an ku zimanê serdest neke qurbana nakokiyên etnîkî. Çima? Ji ber ku ziman afrîdeyekî bêlayen e, gunehê wî di kiryarên hovane de nîne.

Mirov eger du zimanan yan jî bêtir bizanibe, bêguman dewlemendiyek e ku bi dest her kesî nakeve. Gelek mirov hene, berê xwe didin welatekî ku ji zimanê wî hez dikin û bi salan li wir dimînin ku fêrî wî zimanî bibin. Ez hinan nas dikim, mîna Hadî El Elewîyê rehmetî ku fîlosofekî ereban î mezin bû û dostekî dilsoz ê gelê kurd bû û ji şîroveya min a Mem û Zînê re pêşgotinek hêja nivîsîbû, li Çînê mabû û fêrî zimanê çînî bûbû, pê dixwend û dinivîsî. Carekê ez çûm li Şamê bûme mêvanê wî. Ewî li ser deriyê xwe bi erebî û çînî nivîsîbû. Li mala wî jî wêneyên fîlosofê çînî Law Tsê û nivîsên çînî dîwarê wî xemilandibûn.

Ê me kurdan, ji mecbûrî em herî kêm fêrî du zimanan dibin. Ji ber ku em bindestê sê neteweyan in divê em her yek li beşê xwe fêrî zimanê neteweya desthilatdar bibin. Êdî di navbera „me" û wan zimanan de dijminahî derdikeve holê. „Em" di kûrahiya hinavê xwe de, di dilê xwe de dijmintiya wî zimanê serdest dikin. Em ziman û desthilatdar wek hev dihesibînin. Êdî em ziman jî alavekî çewisandina xwe û zimanê xwe dibînin. Heta radeyekê ev hizr rast e. Dijmin, yan desthilatdar berî her tiştî dixwaze ziman bi bindestên xwe bide jibîrkirin. Dagîrkirina rûhî rê yan li ber dagîrkirina giştî ve dike, û ew dagîrkirina rûhî jî qet nikare pêk were eger milletek girêdayî zimanê xwe bimîne. Me got divê mirov „zimanê dijmin" an ku zimanê serdest neke qurbana nakokiyên etnîkî. Çima? Ji ber ku ziman afrîdeyekî bêlayen e, gunehê wî di kiryarên hovane de nîne. Zimanê erebî mesela, ne zimanê Seddam Husên û BeşarEsed e. Ew zimanekî ku di pêvajoya dîrokê de li serdestê gelek neteweyan (Kurd bi xwe di nav de)hatiyesîqalkirin û bi pêş de hatiye. Lê li vir divê milletek, yan jî kesek zimanê xwe jî kêm nebîne ji ber ku ew bindest e, divê bindestiyê neke eyba zimanê xwe. Gelek helbestvanên kurd hene, di dema ataturkiyetê de bi dizî bi kurdî nivîsin, nifşên min bi xwe di serdema Baas de di quncên tarî de wêje û ziman bi pêş de bir. Fêrbûna kurdî sûcekî giran bû di dewleta faşîst a Baas de.

***

Mirov dikare bi du zimanan di yek katê de hestên xwe derbibirre. Bi taybetî gava ku her du ziman ji zarotî de bi mirov re mezin bûbin. Ez wek mînak, erebî li ba min hema hema zimanê dayikê ye. Ji pênc saliya xwe de bi awayekî firehtir ji kurdî ez fêrî erebî dibim. Li mal, bi dayik û bav û xweh û bira û cîranan re ez bi kurdî diaxivîm. Tenê diaxivîm. Lê li dibistanê, ez bi erebî fêr dibûm ku bixwînim û binivîsim û bi mamoste re biaxivim. Wisa her du ziman, erebî û kurdî li ba min bi hev re li rex hev mîna cêwiyan xwedîbûn û mezin bûn. Şêrîniya kurdî taybetmendiyek wê hebû û heye. Ew zimanê diya min e, zimanê bavê min e, yanî ew zimanê hebûna min e. kûr heta tu bibêjî bes di hindirê giyanê min de çûye. Erebî jî zimanê mêjî, fikr, hest û gelek aliyên din e. Erebî pencereya min î ku min tê re li wêjeya cîhanê, felsefeya dunyayê nihêrîye.

Helbet gava ez kurê welatekî serbixwe bama, dikaribû erebî ji min re nebûba meraq jî, lê vê mecbûriyetê aliyekî xwe yê erênî hebû û encamek qenc da.

Mixabin dema ku ez romanekê bi erebî dinivîsim, gelek kurd hene dilê xwe digrin, dibêjin: Çima tu bi „zimanêdijmin" dinivîsînî? Jixwe hinan jî sixêf kirin min û bi gotinên zêde kirêt pêşwaziya nûçeya derketina yekemîn romana min î erebî kirin. Ji bo min nenivîsîna bi erebî mîna veşartina gencîneyekê ye, mîna veşartina dermanekî ku divê were bikaranîn e. Loma jî ez di navbera her du zimanan de, kurdî û erebî mîna ku di hêlanekê de bim diçim û têm.

Min xwe gelekî ragirt da ku bi erebî helbestan û romanan nenivîsim. Heta ez bûme pêncî salî min her hestên xwe bi kurdî nivîsîn. Zimanê erebî ji bo min zimanê lêkolîn û wergerê bû. Lê êdî ava ku di binê erdê de kom bûbû, bêgav bû ku rêya xweber bi jor de bibîne, biherike û mîna kaniyekê biteqe.

# Hişê kolonîzebûyî, zanavê kolonîzebûyî (2)



BEHROOZ SHOJAI






Jibo şkandina cîhanbînîya turkosentrîk divêt zimanê kurdî bihête desthilatdar kirin; û desthilatdarkirina zimanê kurdî tenê bi geşedan û bikaranîna wî di vatişên rojane li bajaran û afrandina vatişên sîyasî û zanistî de mumkin e. Yan na prosesa "kırolaşma"yê dê di reproduksîyona "kıro"yên civakî û sîyasî de berdewam bike.

Dİ beşa yekem ya vê nivîsê de amaje li dîyardeya dekulturalîzasyona mirovên kurd hatibû kirin, ku ji perspektîva dîtirê xwe de, xwe û gerdûna xwe pênase dike. Di vê arasteyê de bi berawird bi têgeha Totep ya "deculturalized negro" [reşikê dekuluralîzebûy] me parallelek bi dîyardeya "kırro"ya tirkî re kêşabû û di hevtevneka civakî de hewl di şirovekirina vê dîyardeyê de dabû. Wekî di wî beşî de hatibû amajekirin, "kırro"yên civakî di adaptasyona bi kultura serdest de, stratejîyên self-oryantalîzmê peyrew dikin. Lê ew tenê di çarçoveka civakî de dikarin bihêne kategorîze kirin. Kategorîya din ya "kirrobûnê" sîyasî ye. Şopên vê werçerxana psîkososyal divêt di tevgerên rewşenbîrî yên destpêka sedsala borî de bihête dîtin. Rewşenbîrên kurd bi piranî ji malbatên arîstokrat li Stenbolê kom bûbûn û li wir perwerdeyeka "modern" ligor pîvanên rojavayî wergirtibûn. Vê perwerdeyê ew digel realîteyeka din aşina kiribûn, ku berî hingê ne dîtibûn, ne jî bihîstibûn. Di hişê van rewşenbîran de dîkotomîyeka radîkal di navbera realîteya Kurdistanê û realîteya ku ew pêre aşina bûbûn çê dibe. Yek ji van rewşenbîran Ismail Hakki Baban, cudahîya ketwarê Kurdistan û "milletên medenî" wiha şirove dike:

"Bütün akvam bu terakkî ve tefyiz yollarını çiğneyerek arabalara, şimendöferlere otomobillere müsaid şahrahlar vücuda getirdiler ... Kürdün yolu ise çıplak bir vahşetzardır. Üzerinde pek seyrek ayak izlerinden başka bir şey görünmez." (Rojî Kurd. No 3, 1-14 tebax, 1913) [Hemû gelan rêkên tereqqî û fezîletê buhurandin; bi erebe, tren û otomobîlan şahrêyên musaid anîn wucûdê... herçî rêya kurdan e, wehşetzedeyeka rût e. Liser jibilî çend şopên pê tiştekê din xuya nake.]

**Xwe-nefret**

Di hiş û binhişê kurdên perwerdeyîbûyî de xwe-rexnegirî ber bi xwe-nefreteka nepenî de werar dibe. Wekî Stroheimer (2003:45) destnîşan dike "elîta kurd bi çavê heqaretê li hemwelataîyên xwe yên prîmîtîv dinêrî," ku meyên wan yên civakî-sîyasî dijberî gelê wan bixwe bûn. Nebûna bîra dîrokî û çavkanîyên ku bikarin pê serbilind bin wan di hêla sîyasî de jî ji gelê kurd havî dike. Ji ruwangeha wan divêt miletên xwedî şaristanî û zanîn bibin xwedanê kîyanên sîyasî. Yên ku ev mîras nebin, mehkûmî nemanê ne, Abdullah Cevdet di Xitaba xwe de dibêje:

"Em di êwra teşegirtin û dîyarkirina neteweyan de dijîn. Çewan ku takekesek heger kesayetîyeka mueyyen (dîyarkirî) û mutemeyyiz (cîyawaz) nebe, nikare bibe haizê (xwedan) qîmeta ictimaî (nirxê civakî), miletek jî rêz jêre nahête girtin. Ji ajelên axêver zêdetir nikare bibe tiştek. Melekeya hafizeyê ji takekesan çi be, dîrok jî jibo miletan wî rolî digêrre... heger miletekî dîrokeka mezbût û mukemmel nebe, heçkû ew milet qet nejîyabe. Gelo dîroka kurdan heye? Bi Şerefnameyekê miletek nikare şerefa dîrokî yan dîroka şerefa xwe teserruf û muhafeze bike (biparêze). Esra ku em têde dijîn ne esra henekan e, esra bîstan e. Miletê ku ne xwedanê dîroka rabirdûya xwe, dîroka dahatîya xwe be, ne xwedanê xwe ye jî. Û milet û ferdên ku ne xwedanê xwe bin, memlûk (benî/ebd) in, dibine malên kesên din." (Rojî Kurd, No 1. rr 3)

**Kurd; neteweyê bêdîrok, ango neteweyê nemeşrû**

Abdullah Cevdet kurdan bi tirkan û gelên Ewropayê re berawird dike. Di bawerîya wî ya sosyaldarwînîst de, tenê miletên xwedî dîrok mafê hebûnê heye, yên ku ev nebin, mehkûmî ebdîtîyê ne. Bi vê boçûna hîstorîsîst (dîrokgerane) û sosyaldarwînîst Abdullah Cevdet bi awayekê self-oryantalîstî ji berçavkê modernîteya sekuler ya Jon-Turkan li kurdan dinêre. Beşeka mezin ji rewşenbîrên kurd yên wê çaxê bi van hizrên xwedêgravî "modernîst" ji kurdbûna xwe havî dibin. Di hişê wî û rewşenbîrên din ên kurd de hizra "millîyet-i meşrue" [netewayetîya rewa] teşe digire. Lê kurd premîsên vî neteweyê rewa danagirin; dîrok nehin, ziman nehin, edebîyat nehin, bîr nehin û paşdemayî ne.

Her di wê serdemê de mirov dişêt du grûpên rewşenbîran pênase bike; modernîstên wekî Abdullah Cevdet û yên prîmordîyalîst wekî Kurdî-yi Bitlisi, ku hewl didan dîroka kurdan vejînin. Tişta balkêş, yên ku herî zêde liser civaka kurd xwedî hizreka rexnegir in, paşê alî diguherin. Tevî Abdullah Cevdet, kesekî din, ku bi pamfletên paternalîstî rexne li civaka kurdî dike, Mehmed Şefîq Arvasîzade ye. Piranîya binemala Arvasî paşê bûne muşewwiqê teorîya tûranîzmê.

**Gelê layiqî assîmîlasyonê**

Di vatişa M. Şukru Sekban de mirov hêj di serdema berî alîguhertina wî de, bi hin dudilîyên wî dihese. Di nameyeka xwe de ku Sekban jibo Komarê rêbazan dîyar dike, bi rex alternatîva asîmîlasyonê, Sekban tenê di çarçoveya Komarê de hêvî dike, ku komar kurdan wekî milet nas bike û rê bide perwerdeyê bi zimanê xwe bike. Sekban herwiha destnîşan dike, ku "di roja ku peyman (a Sevres) hate îmze kirin de, herçende mafên sîyasî yên kurdan hate venasîn, lê kurd tevî tirkan di şînê d bûn." Nêzîkî 90 salan bi dû re, yek ji rêberên partîya pro-kurd DTP, Aysel Tugluk peymana Sevrê wekî "trauma" bi nav dike. Sekban dixwaze girêdana xwe bi osmanî û warisê wê Komarê re îsbat bike. Tenanet dîyar dike, "heger tirk bikarin kurdan asîmîle bikin, ezê pir kêfxweş bim." Lê dibêje ev yek ne mumkin e. Herçende bixwe ne li dij e! Piştî têkçûna hereketa Xoybûnê, Sekban êdî bawerî bi sîyaseta asîmîlasyonê dihîne û xwe dide alîyê kemalîstan.

Ev tenê çend nimûne ji rewşenbîr û sîyasetmedarên kurd yên wê serdemê ne. Ev sîyaset hîn jî didome; jibo derêxistina kurdan ji havîbûna paşdemayî, ango kaşkirina (!) wan bo modernîteyê divêt ew asîmîle bibin. Fevzi Pirinççizade yê ku berê endamê Hêvîyê bû, di simeta mebûsê Dîyarbekrê (1920-1927) de wekî wezîr jî di hindek kabîneyan de cî girt. Zîya Gokalp alîgirê herî sersext yê asîmîlasyonê jî ji Dîyarbekrê bû. Hereketa dawîn ya ku nasnameyeka kurdî, vatişeka kurdî û zimanekê kurdî hebû derveyî bazineya van rewşenbîra û di dilê Kurdistanê de damezra, ku ew jî Hereketa Azadî bû.

**Kurdbûn tenê zanavê dekoratîv e!**

Berovajî çend rewşenbîrên botî (Bedirxanî), colemêrgî (Rehmî), Silêmanî (Pîremêrd û hd) piranîya rewşenbîrên modernîst ên kurd cezbî modernîteya tirkî bûn. 70 salan bi dû wan re li bakur çend hereketên çep derketin, ku modernîte di qalibê dijayetîya normên civakî ya kurdî, di serê druşmên wan de bûn. Hertiştên ku bi ziman û kultura kurdî ve bihata grê dan wekî paşverû dihate pênase kirin. Tenanet bikaranîna zimanê kurdî wekî medyum di hişê van kurdan de heleyeka epîstemîk e, jiber ku bi bawerîya wan kurdî ne zimanê epîstemê, lê tenê zimanê tingetingên folklorîk e. Bi vî teherî hereketên kurd yên piştî CCII ku di hevîrekê çepê ê kemalîst de hatine bedperwerdekirin jî dibine xwedan heman hişê kolonîzebûyî. Di pratîka van hereketan de, kurdî ne zimanê afrandin û tenanet derbirrîna vatişa sîyasî ye, tenê markorê zanavî ye. Ango tenê roleka dekoratîv bo beyana zanavî dileyîze; ne beşek ji pratîka jîyanê ye. Ne seyr e, ku hereketa serekî ya bakur ticarî kurdî ji xwe re nekirîye zimanê îdîyomatîk, ev hereket hewlên derbirrîna zimanî tenanet wekî nîşanên paşverûyîyê pênase dike.

Bi hişekê wisa kolonîzebûyî, bi cîhanbînîyeka di hebsa konspetuel de, mirov dikare çîneka rewşenbîr û rêxistinên kurdî wekî "kırro"yên sîyasî pênase bike. Jibo van "kırro" zanavê dekoratîv ê kurdî ne îdîyomatîk û karberî ye. Ango ne fonksîyonel e, tenê amrazî (amûrî) ye. Rewşenbîrê kurd ê bajarên mezin û metropolên tirkan hişmendî bi kurdbûna xwe hene, lê wekî hindek rewşenbîrên kurd ên destpêka sedsala borî, kurd, zimanê kurdî, dab û nerîtên kurdî jibo wan dîyardeyên bîyanî û gundewarî ne, ku ew xwe têde nabînin. Di haleta herî qenc de kurdî wekî medyum û navgîna folklorîk hatîye bi kar anîn. Bo nimûne li bakur, hejmara berhemên teorîk û zanistî yên ku di van 30 salên dawî de bi kurdî hatine afrandin nabe yek ji sedê berhemên fîktîv û folklorîk! Muzîka kurdî hîn jî muzîkeka derbajarî û gundewarî ye; tenanet tekstên artîstên kurd jî hîn motîfên xwe ji gundewaran dihînin! Çîna navîn, entellektuelê kurd yê bi nasnameya kurdî (?) guhê xwe dide stranên çîneka navîn, ku ne kurd e, jiber ku muzîkeka wisa tune. Di programên ZarokTV de ku keça min berdewam lê dinêre, motîf û paşxanên stranan hemî derveyî bajaran in, heçku zimanê kurdî tenê bi kêrî şivantî, gundîtî û sergînan dihêt.

**Çare; itaetnekirina entellektuel**

Ev hemû berhemê bedperwerdeya asîmîlatîv in, ku bi seksîzm, klassîsm, rasîsm, ojenîk, jenosîd, arasteyên kulturî û praktîkên din yên civaka serdest dibine sedema hebsa konseptuel, dekulturîzasyon û bêxemîya hînkirî. Niha kurd li Tirkîyê ne hemwelatî, lê pseudo(sexte)-hemwelatî ne, ku normên cîhanbîyeka tirkosantrîk di hişê xwe de vehewandine. Heta ev cîhanbînî di hişê kurdan de hakim be, hebsa konseptuel û bêxemîya hînkirî di tevgerên jîyan û xebatê de jî xwe nîşan bidin. Gelê ku hatîye dekulutralîze kirin ji çend merheleyan derbas bûye, ku ev jibo kurdan li bakur jî derbas dibe. Ev merhele birîtî ne ji (1) bêqîmet cilwedana kultura kurdan û bîyanîkirina wan ji mîrasa kulturî ya wan. Ango ji ziman û cîhanbînîya wan, (2) Hevotina wan ku tenê arasteyên kulturî yên serdest (tirk) wekî ziman, cîhanbînî û berhemên edebî-kulturî yên wan bihebînin, (3) Asîmîlekirina wan di pergaleka civakî ya serdest wekî alîgirê û parêzvanên xwe.

Tenê rêya berengarbûn ji vê dîyardeyê proseseka berovajî ye; ev proses tenê bi rêyekê mumkin e; rûxandina hebsa konseptuel, ku dîwarên wê ziman û cîhanbînîya tirkî ye. Jibo şkandina vê cîhanbînîyê divêt zimanê kurdî bihête desthilatdar kirin; û desthilatdarkirina zimanê kurdî tenê bi geşedan û bikaranîna wî di vatişên rojane li bajaran û afrandina vatişên sîyasî û zanistî de mumkin e. Yan na prosesa "kırolaşma"yê dê di reproduksîyona "kıro"yên civakî û sîyasî de berdewam bike. Metoda vê yekê itaetnekirina entellektuel e; ango têdana vê cîhanbînîyê bi bikaranîna kurdî di produksiyona entellektuel de ye.



# Helebçe, Bîra Neteweyî an jî "Dayê, bêhna sêvan tê!"



**MIHEMED SANRI**

**ÎHTIMAL** e ku dema hûn ji mirovekî cihû bipirsin: "Gelo hûn 'Auschwitz'ê çawa bi bîr tînin?" Dê ji we re bibêje: "Em her roj, her gav û her seat bi bîr tînin." Bîra (hiş, hafize) kolektîf tiştekî weha ye.

Helbestvanê kurd Şêrko Bêkes di helbesta xwe ya navdar ya li ser Helebçeyê de weha dibêje:

"Birano!
Tenê cudahîya navbera me ev e
Bajarê min wisa kuştin ku, deqîqe jî pê nehisîya."

Belê, deqîqe jî pê nehesîyan; herweha ev dinya, mirov û tu pêkhateyên mirovan, bi navê dewletên damezirandî, qet pê nehesîyan. Çavên ku bibînin, guhên ku bibihîsin qet tune bûn. Lewma, Helebçe ne tenê bi çekên kimyewî yên rejîma xwînawî ya Saddam hate qetilkirin; ew bi bêwijdanî, bêhiqûqî û bêehlaqîyê jî hate qetilkirin ku li seranserê dinyê, di heqê miletê kurd de hate kirin. Her çi dîn, wijdan û îman hebûn ew bêdeng man. Makîneya wehşetê bi agir û hesin, bi çekên kimweyî yên jehrîn û bi bêhna sêvan mirineke ji pêlên bayî gelekî bileztir li Helebçeyê dibarand; û deqîqe jî pê nedihesîyan.

Divê kurd baş bizanin ji bo çi gund û bajarên wan bi metodên dema modern yên herî kujer û xedar ji holê dihatin rakirin, lê belê deqîqe jî pê nedihesîyan. Dinya bo çi heta niha li himberî trejadîya kurdan kerr û lal bû ku bi sedsalan e berdewam dike?

Divê bîra kolektîf a kurdan xurt be. Divê kurd Helebçeyê ne ji salê ta salê bi bîr bînin, lê her wekî birayên xwe yên cihû, divê Helebçe her gav û her deqîqe li ber çavê wan û di hişê wan de be. Mebest ne ew e ku ev hiş û bîr wekî trawmayekê her li cîyê xwe bimîne. Lê ji bo ku careke dî karesateke weha hov neyê serê zarokên wan, divê Helebçe her tim di bîra wan de be.

Hin zarokên Helebçeyî hebûn, dema temenê wan giha 4-5 salîya xwe, nû li xwe hay bûn ku wan tenê dayikek an jî tenê bavek heye; heta hin ji wan ne bavek, ne pismamek, ne apek, ne xaltîyek, ne xwişkek û ne jî birayek heye. Ji ber ku dema Helebçe di deqîqeyekê de hate qir kirin, ew bi tesadufî digel dayik an jî xizmekî xwe, li cihekî, li gundekî an jî li bajarekî dî bûn. Wan di derheqê Helebçeyê de bi tiştekî nedizanîn û dipirsîn: Çima zarokên dî merivên wan hene, çima yên wan tune ne? Zarok bi bêhna sêvan mirin. Ew bêdewlet bûn. Gotin pir hêsan e, ne weha? Dev ji mirovên biyanî berdin; gelo çend rewşenbîrên kurd dizanin ku di gotara mezin ya kurdî de bêdewletî tê çi wateyê?

Bifikirin ka zarok çawa dibêjin: "Dayê, bêhna sêvan tê." Lê ew qet nizanin ew bêhn a mirinê ye ku bi teknolojîya herî kujer li wan dibare.

Rêxistinên welatên misilman, nûnerên Neteweyên Yêkbûyî, Xaça Sor, rêxistinên xêrxwaz û mirovhez jî dengên wan zarokan nebihîstin ku di xulekekê de bi bêhna sêvan mirin.

Gelo hunerên kurdî yên piştî Helebçeyê çawa ne? Sînema, mûzîk, edebîyat, mîmarî...?


İsmail Beşikçi alimekî hêja ye. Xalek jê ev e ku Beşikçi ji bo kurdan her tim wekî hişyarî dubare dike: "Xetereya ku miletên bêdewlet bikevin ber jenosîd û kîmyebaranan her tim heye." Vêca we fêm kir ka çawa tilîyên şairê kurd hişk bûn, qelema wî firîya, bi qasî deqîqeyekê bi tenê jî wî jenosîda Helebçeyê nebihîst?

Belê, divê kurd van trajedî, kareset û jenosîdan; Helebçe, Dersîm û Zîlanan qet ji bîr nekin û divê wan bikin hîmên polayî yên bingeha dewleteke ji pola. Ew dewlet divê li ser her bihosteke erdê, di bin her bihosteke asîman de per û baskên xwe ji bo parastina zarokên kurdan vekin.

Ger dewleta Îsraîlê nehatibûya ava kirin, li dinyayê tu carî bi vî rengî behsa holokosta cihûyan nedihat kirin. Di encama Herba Cihanê ya Duyem de, li dora 40-50 milyon mirovî hatibûn kuştin û 6-7 milyonê wan cihû bûn: dê bi tenê weha bihata bibîranîn. Lê îro hemû dinya baş dizane ku ji lîteratura hiquqê heta termînolojîya krîmînal, ji lêkolînên zanistî heta muzexaneyan, ji sînemayê heta edebîyat, wenê û mûzîkê endustrîyeke pir ejdehayî ya "Auschwitz"ê –mebest hemû holokost e- heye. Auschwitzê di her warî de, di her şaneyeke dewleta Îsraîlê de cih û îradeyeke polayî wergirtîye.

Heta kurd nebin dewlet dê her tim Helebçe, Dersim û Zîlanên nû li ber derîyê wan bin. Zarokên wan dê bi bêhna sêvan bimirin. "Dayê, bêhna sêvan tê!" Zarok bi bêhna sêvan li ser xefka mirinê kom kirin! Dest û tilî li şairê kurd hişk bûbûn, qelem firîyabû, bajar kevokek fetisîbû!

*"Birano!*
*Tenê cudahîya navbera me ev e*
*Bajarê min wisa kuştin ku, deqîqe jî pê nehisîya."*
Helebçe ne tenê bi çekên kimyewî yên rejîma xwînawî ya Saddam hate qetilkirin; ew bi bêwijdanî, bêhiqûqî û bêehlaqîyê jî hate qetilkirin.





**MURAD CIWAN**

## Sê alîyên referandûmê -II

Hefteya çûyî, bi behsa zelalkirina alîyê destûrî yê referandûmê dawîya nivîsê hatibû, nuha ez ê mihawele bikim ronahîyê bidim ser alîyê duyem: konjuktura siyasî.

***

Kartêkirtîrîn alîyê referandûmê, yê siyasî yê konjuktura heyî ye. Hêza desthilatdar, her awayê rê û dirban bi kar tîne da karibe guhertinên destûrê bi rêjeyeke bilind bide qebûlkirin. Hevkarî li gel baskê MHPê ê navendê kiriye. Rewşa neasayî, ra û bizavên redkirina referandûmê tengav kirine. Berpirsên îdarî û ewleyî desthilat kirine zext ji bo rêlibergirtina çalakîyên mixalif. Medya bi piranî ketiye bin destê û fişara desthilatê; akademîsyen, nivîskar û rojnamevan bi tuhmetên terorê hatine girtin. Derfetên nasandina kilûkêmasîyên û xerabîyên guhertinên nuh, kêm bûne. Di serî de li Kurdistanê, li hemû deveran û hema hema di nav hemû çîn û tebeqeyan de girtinên bi girseyî berdewam in. Bêterefî û serbixweyîya dadwerîyê nemaye. Li Kurdistanê ji ber şerekî dijwar ê narewa, xelk talan bûne, bê war mane. Sindoqên referandumê, dê di rewşeke gelek tengav a nedemokratîk de bên danîn.

Ji alîye din ve, baskên erê-nayê yên rikeberîya li ser referandûmê, gelek tevlihev in; ne ku li alîyekî azadîxwaz, demokrasîxwaz û pêşkeftinxwaz, li yê din mihafezekar û dijberên azadî û demokrasîyê hatine hemberî hev. Li her du alîyan jî, ji hêzên maqûl bigire heta yên gelek qirêj kom bûne: Li ba erêxwazan AKP, baskê navendî yê MHPê û HUDA-PAR hene. Bera naxwazan tevlihevtir e; CHP bi nasyonalîstên xwe yên rast û çep ên kemalîst, ergenekonî, wesayetgêr-ulusalcî-Perinçekî, Fethullahîyên têkçûyîyên derbeyê û HDP/KCK'yî rêz bûne. Baskê mixalefeta MHP'ê ku xurt e, BBPyî û Partîya Seadetê jî di vê bereyê de ne. Ne dûr e ku beşek ji AKPê jî biçe ba bera "na"yê. Bereke ewqas têkilhev û berfireh e ku cih li îhtîmala erêkirina guhertinên destûrê asê dike. Eger nayeke piranî derkeve dê nebe surprîz.

Desthilata AKPê ji dawîya sala 2010an bi vir de, gav bi gav ji reforman poşman bû. Wê, piştî hilbijartinên 7ê Hezîrana 2015an, hin suîqasdên gumandar û îlankirinên xweserîyên hin bajarên kurdan ên provakatîf ên bi fermana KCKê kirin bahane, prosesa aştîyê û çareserîya pirsgirêka kurd rawestand, rêya şerê kavilkirina warên kurdan ya bêserûber hilbijart . Piştî teşebusa darbeya 15ê Temûza 2016an, rewşa neasayî îlan kir, gelek kes ji kar hatin avêtin, bi deh hezaran sermiyandar, nivîskar, akademîsyen û karmendên dûrî teror û derbeyê jî hatin girtin, rikeberîyeke gelekî no ya bêbeş ji xweşbînîyê ketiye nav civakê. Mexdûrî û bedbînî tesîrê li referandumê dike, nahêle qonaxa destûrê li ser raya xwe biçe. Nefret û hêrsa kutleyî ya ji desthilatê, dibe bingehê tercîhkirina dengdanê. Bêperwayîya rikeberîya siyasî, ter û hişk tevlîhev kirine, jar û bêguneh jî bi kutleyî ketine berê. Meriv fahm dike çima ew ne rasyonel, bi hêrs û hest tevbigerin, ne ji ber naveroka destûrê, lê ji ber konjukturê bêjin "na".

Tevî tarîstanîya rewşa konjukturî, rastî ew e ku di tarîxa Cumhûrîyeta Tirkiyeyê de, bi zêdeyîya karên nîvçehiştî û lêpoşmanbûyî jî mestirîn reform di dewra hukûmetên AKPê de bûn. Reformên warên aborîyê û avakirina jêrxana Tirkiyeyê nayên înkarkirin. De fakto be jî hebûna kurdan qebûl bûye, medyaya kurdî tevî dijwariyan jî weşanan dike. Kiz be jî îmkana fêrbûna zimanê kurdî heye, li zankoyan beşên kurdî hene -her çendê ew nuha tûşî tengavkirinan dibin. Partîyên kurdan bi navên kurd û Kurdistanê ava bûne, xebatên xwe, rêgirîyên rewşa neasayî hebin jî, bi alayên xwe yên Kurdistanê dewam dikin. Bifikirin ku ew serbestîya hukûmeta Tirkan daye partî û medyayên kurdan, li Rojava hukûmeta xweserîyê ya bin baskê PYD/YPGê nedaye. Buro û nûçenêrên medyaya Kurdistana başûr ji metropolên Tirkiyeyê û bajarên Kurdistanê weşanan dikin; ev serbestî ne li Îranê, ne jî li Suriyeyê heye.

Reformên piştî 15ê Temûzê ên di warên eskerî de ku hêzên bejayî, hewayî, deryayî û cendirmeyan bi wezaretên cuda ve hatin girêdan; akademî û fêrgehên eskerî ku hatin hilweşandin û sivîlkirin, pişt li wesayetê û niyetên derbeyeke eskerî şikandine. Divê tevî taristana konjuktura nuha em van reformên girîng bibînin.

Loma, di konjuktura nuha de, armanca azadîxwazan bi taybetî jî ya kurdan divê ne ew be ku desthilata AKPê hilweşe, di şûna wê de CHP bi palpiştî û hevkarîya wesayetgêr-ergenekonî awrasyayî û derbexwazan bi ser keve. Ya li berjewendîyên kurdan ew e ku AKP û Erdogan dawî bînin li hevkarîya li gel MHPê, wesyetgêrên esker-burokrat yên piştî tasfiyekirina Fethulahîyan dezgeyên dewletê dagirtî û siyaseta kurdkuj, vegerin ser berdewamkirina reforman û çareserîya pirsgirêka kurd li Bakur û hevkarîya li gel Kurdên Başûr û Rojhilat.

***

Dawîya nivîsê, hefteya bê…

# Rastkerdiş

Wendoxê erjayeyî hûmara 9. ya BASî de bi nameyê Çimeyê Pêserîya Kirmanckî (1) Kovara Dengê Komkarî yew nuşteyê mi weşanîyaybî. Heyf ke ê nuşteyî de çend xeletîyê minê muhîmî bîyê. Ez seba nayê şima ra efê xo wazena û derheqê Dengê Komkarî de melumatanê rastkênan pêşkêşê şima kena û îfadeyê ke xelet ê, înan zî nîşanê şima dana:

Kovara Komkarî ke 1979 de dest bi weşanê xo kerdo pêropîya 129 hûmarê aye neşr bîyê. Hûmara 129. û tewr peyêne 1991 de weşanîyaya. Mi bi xo 121ê înan (1-121) dîy û tek bi tek kontrol kerdî. Ez çarçewaya nê 121 hûmaran de vana; qaso ke mi dî 22 hebê înan de metne kirmanckî estê. Kesê ke nuşteyê înan kovare de weşanîyayê tena nê yê:

Munzur Çem, Baran, Bıra, Azad Dılêr, Aliqemer [Munzur Çem], Teko, H. G., Yad o Dersdar, Dêrsim Şoreş, Lacek Şımaran (8 tekstî zî bê nameyê nuştoxan neşr bîyê)

Hetê tewirê nuşteyanê kirmanckî ra ez şêna vajî ke na kovare de tekstê sey sanike, mesela, deyîre, metnê folklorîkî, şîîre û metnê ke formê vilaweka sîyasî de nusîyayê neşr bîyê.

**Çend çîyê bînî;**

1)“Roze Roza Destpêkerdena” (hûmara 24. de) û “Xeleşayêna Welat” (h. 26-27-28) formê vilaweka sîyasî de nusîyayê la nê vilawekî warê vilaweke de tekstê tewr verênî nîyê, înan ra ver zî vilawekê winasî estê.

2) Eke ez şaş nêba mektuba tewr verên a ke hetê yew kirmancî/zazayî ra erşawîyaya weşanêkê kurdkî, hûmara 15-16. ya Dengê Komkarî de, rîpelê “Okuyucu Mektupları” (Mektubê Wendoxan) de bi sernuşteyê VARTO neşr bîya. Keso ke na mektube nuşto, nameyê ey sey H. G. neqil bîyo. Qismo verên xelet o yanî naye ra ver zî mektubê winasî erşawîyayê sewbîna weşanan.

3) Nê nuşteyî;

-Demir Özlü, “Mergê Xalit Begê Cibrî”, Tadayox: Malmîsanij”

-Hesenî Giran [Alî Tayfun], “Dîyarbekir ra Roj bi Roj”

Kovara Komkarî de neşr nêbîyê û naye ra teber zî tesnîfbîyayîşê nuşteyê corênî xelet o. No metin yanî “Mergê Xalit Begê Cibrî” yew nuşteyo edebî yo, hîkaye ya. Eleqeyê nê nuşteyî û tarîxî esto la nuşte nuşteyê tarîxî nîyo.

4) Hûmara 62. ya denge Komkarî 15. 02. 1984 de, hûmara 70. zî 16.11.1984 de çap bîyê.


MUTLU CAN

Çimeyê Pêserîya Kirmanckî (1)

Kovara Dengê Kom

TARÎXÊ nuştişê kirmanckî çimê mi de babetêka zaf muhîm a. Aye ra ez wazena na babete ser o dergûdila vindera. Herçiqas edebîyat yan zî ekolê ma yê nuştekî nîsbet bi kurmancan û soranan tay bo zî yew pêserîya (birikim) ma ya cidî zî esta. Çimeyê na pêseriye sey yê dewranê verênan yê heme ziwanan kovar û rojname yê. Raşt o destpêkê edebîyat yan zî ekolê nuştişê heme ziwanan de -helbet qestê ma demo modern o- kovar û rojnameyî manaya muhime îfade kenê la yê ma rewşêka spesîfik a. Ez bi xo vana qey dinya de sey kurdan zaf miletî çin ê ke kovar û rojnameyê înan, tarîxê ziwan û averşîyayîşê edebîyatê înan ser o rolêko hende pîl û muhîm kay kerdo. Planê peyên yê nê tespîtê mi de, politîkaya asîmîlasyonîst û kolonyalîst a ke ronîyayîşê dewleta Tirkîya ra nata kurdan ser o tetbîq bîya, tabloyê neticeyê ey esto. Merdim bîyaro xo vîr ke "kovarê ke Tirkîya de serra 1920î ra hetanî 1970î weşanîyayê, hûmara înan 10î derbaz nêbena" (b. Malmîsanij, İsveç'te Kürtçe Yayınlar, Defter: Edebiyat, Tarih, Politika, Felsefe, Sayı: 13, İstanbul, Nisan/Mayıs 1990, s. 100) fehm keno kurdkî senî îmkananê averşîyayîşî ra mehrum ameya verdayene. (Îhtîmal o ke şima vajê ma seke kurdkî ewro wayîrê zaf îmkanan a? Bêguman şima nêhêq zî nîyê ...) Welhasil kovar û rojnameyê kurdkî/kurdan tena sey yê miletanê bînan, zemînê averşîyayîşê ziwan û edebîyatê înan nêbîyê belkî ey ra muhîmêr bîyê warê pawitişî yê ziwan û kulturê înan. Aye ra goreyê mi îcab esto ke meqaleyê ke tede tarîxê ziwan û kulturê kurdan de cayê kovar û rojnameyan ser o yeno vindertiş binusîye. Ma derbaz bê ca û fonksîyonê înan ra tena kesê ke mabênê serranê 1960 û 2000î



# NASA de di kurdî




Nameyê ey Oktay Arslan o. Aslan bi xo Tûx (Tetwan) ra yo û yew kurd o. Unîversîteya Teknîkî ya Îstanbulî de beşê muhendisîya elektrîkî qedanayo. Eynî serre bi sayeye bursê Tubîtakî İTÜ de masterê xo temam kerdo, dima zî 2009 de zî Instute of Tegnologh de (Amerîka) doktora kerda. Arslan, semedê mulaqatî dawetê NASA bîyo û dima tîya de dest bi kar kerdo.



Oktay Arslan nika NASA (Dayîreyê Hewakarîya Neteweyî û Feza ya Amerîka) de pisporê teknolojîyê robotîkan o. Arslano 31 serreyî vato ke “ez do wasitayanê hewayî ya bê merdiman (bi kilmnuşteyo tirkî İHA) û sîstemanê otonoman ser o xebitîyayîşê xo bidomna.



Zeynep Kurban, cinîyêka kurd a. University College Londonî yê Îngilîztanî ra mezun bîya û pey cû doktoraya xo temam kerda. A zî nika sey Arslanî NASA de xebitîyena. Vateyê ayê balkeş ê; “Ganî semedê ameyeyî xeyalê her kesî estbê. Çîyo ke mi kerdo tena no yo. Tu çî heqîqeten bêîmkan nîyo. Çîyo ke xeyalanê ma, ma rê bêîmkan musneno tersê ma yê nêresayîşê înan û bêhêvî mendişê ma yê. Eke ma firsendan ra baş îstîfade bikê rezuma (cv) ma senî bena wa biba ma eşkenê biresê hedefanê xo.

Kurbane wina dewam kena “Seke Einsteinî vato; Seba deha (daxî) bîyayene % 1 zeka û %99 xebitîyayîş lazim ê .” Eke ma bixebitîyê êşkenê birêsê hedefanê xo. Kesê ke ziwan û kamîya ma ser o tedayan kenê û vanê qey bieşkê bi no hewa ma çin bikê, ganî ma vera înan bixebitîye û biresê hedefanê xo... Ez bi xo îftîxar kena ke sey zanyarêka kurde xebitîyena, ganî ma kurdî pêro bi kamîya xo waranê karî de ca bigîrê û bi ney îftîxar bikê.



Seba ke şima bieşkîn qafikane gozan rehet akerê, înan yew şewe zereyê awa soline de bivindarnîn. Bi no qayde zereyê înan zî do vila nêbê.



Kesê ke qewe şimenê, goreyê ê kesanê ke nêşimenê hîna derg ciwîyenê.



“Mi waşt ke backgroundê ey ra xoser, heykelêko hema-hema her kes biewnîyo ci ra û bieşko vajo ke ‘no, teswîrê şikitişê zincîranê xo û azadbîyayîşî keno’ viraza...”

## Zenos Frudakis



EHMEDÊ DIRIHÎ (AHMET KASIMOĞLU)

# Nebatê ma û ma (1)

Ez 1949 de hela ke tuyeran pelanê xu rişnaynî, mintiqaya Guevdereyî (mabeynî Çolîg û Pali) dewa Pulî de ameya dinya. Qicê û cîwanîyê mi Xarpêt de vîyart. Fakulteyê zîratî yê Erziromî mi wend. 1974 payîz de mi Çolîg de şefîyê silqana dest pê xebate kerd. Embazan mina ver komela kulturî nabî pîyera, ez ke ameya ez kerda serekê komela. BÎNGENÇDER. Ma tay wext de xebateke weş vet meydan. Cayo ke sey Çolîg de, aşma peyine de, ma hîrê semîner dayî. Û ca çinêbî ke goşdarî tede ronişî. La dişmenan o mehel pê şaredarê Çolîgî (CHP) gerreyê ma kerd û komela ma da padayene. Badê eskerîyê mi Erdişê Wanî de xebatê xu dest pêkerd, serrek cuwapey surgunê mi vet Dînara Afyonî, uca ra mi waşt ez şîya Elbîstan. Ucayo ke şarê koyî Kurmanc, ê deştî tirkmen bî.

Şarêdarî Çolîgî (MHP) 1979 de ame kiştiş, zafî nêftareyî endamîyê xu ramojnî, saeta peyin, pê tîfaqê kurdperweran hemine, ez bîya endam. Hîrê hewteyi ez xebitiyaya, bi aşkera ke kurdperwerê Çolîgî paştgerî min î, bê faşîstan ê bînan mi ra qasidî şawitî ke ma pîyê biki. Endamîyê mi yew dalavereya, betal bi. Narey şîya DSÎ(Sazîya Awê ya Dewletî) yê Nusaybînî de, mi dest pê gureyê kerd. Serrek cuwapey darbe virazîya (1980), ez surgunê Yozgat kerda. Yozgat ra serê gureyî ra, ez tepişta arda zindanê Dîyarbekirî. Embazanê dawaya mi (PDK / KDP) ra kes nêmendî, heme merdî yan şehîd bîyî. Ez nika tik û tenya menda.

Ez gure ra veta. Demek mi tîcaretê zîratî kerd, bacê ez pê qerarê mehkemaya, reyna şîya Yozgat DSÎ. Di serre cuwapey ez şîya Ruha, mi bendawa Bavêreşî ser o, awdanê deşta Harranî oerganîze kerd. Uca de mi karê xu yê kulturî newe ra dest pêkerd. Ez Enstîtuyê Kurdî yê Îstanbulî ra pê hesiyaya ke, seba nameyê nebatan a Kurdî, xebatekê çewî çino. Mi hema Ruha de dest eşt na xebate, di sere cuwapey ez ameya DSÎ ya Dîyarbekirî.

Enstîtuyê Kurdî yê Parîsî ra Gruba Kurmancî wesîna mi, ez şîya Duhok mi xebatê xu mojna înan û ney ra pey ez hîn pa nînana ha xebetiyena. Heto bîn a, semedê Kirdî ya zî komelek nîyabî pîyera. Gruba Vate. 2006 ra nat ez ha pa ney embazana, pîya xebitiyena.

Serrê 2009 de ez bîya qursdarê Kurdî yê unîversîteyê Artukluyî. 2011 de hetkarê rektorê yê Artukluyî, konferansek de pê gişta ez mota ra û va, embazê ma weş yew xebatek ho keno. Eke biwazo unîversîteyê ma kîtabê ey weşîneno. Di sere cuwapey, mi xebatê xu girot ez şîya Profesorê Kurdî, Kadrî Yıldırım het. Mi xebatê xu mojna ci, ey û rektor kerd pîye sare û ferhengê mi : Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî nîsanê 2013 de weşîya.

No ferheng pê hîrê ziwanan a nusîyayo. Kurdî – Kurdî, Tirkî û Latînî. Mi ziwanê Kurdî sey Kirdî, Kurmancî, Soranî û Goranî ciya nêkerdo. Mi name kam ca ra yan kî ra giroto, ney nîşan dayo. La çi heyfo ke, sere de ez ney nêfikiriyaya. La rojekê mi dest pêkerd, hetan ney pê hesiyaya, mi çime nîşan nêdayo. Xebata winasî de hewceyê zaf o. Û xebatê ziwanê Kurdî de no pirse hîna beno giran. Çinke zanayê ma zafîne fekkî yo, nuştekî nîyo.

Badê weşînayîşê ferhengî mi, ferhengê Pr. Mesud Kitanî nebatanê Başûrê Kurdistanî û Îraj Moradî zî yê Rojhelatî Kurdistanî nuştîbî, ginayî mi dest. Serrê 2013 de unîversîteyê Duhok ra Pr. Selîm Şahbaz nebatanê tibîyan pê ziwanê Îngîlîzî ya dayo zanayîş û nameyê nebatan pê ziwanê Latînî, Kurmancîû Erebîya dayo ma sinasnayîş.

**Nebatê werdê ma**

Cuwîya ma însanan de cayê nebatan ma çiqas vacê, ehendê zaf – zaf o. Ma û heywananê ma rê benê werdî, ma rê benî darû – derman, ma rê benî jehr – ziqqûm, bingeyê kincanê ma yî, taynîna ma boyax peyda kenî, taynîna ma dor –verê xu xemilnenî, bê tahnê nînan, dinya ma rê teng û tarîya.


Ez şima ra persi nê çi çîyî, şima zanaye heme têfek ra vanî nebat î. La nameyê înan ê ziwanê ma de bipersî, zafînê şima pê nêzanî. Bêrê ewro, ma dest pê biki, hêverî nebatanê xu yê werdî, dima ra nebatanî bînan pîya bisinasni û bidi sinasnayene. Verînanê ma kirdan heme nebatanê xu name daybî û sinasnaynî, la ewro dewijî ma hêdî hêdî nameyê înan hê tereknenî, xu ra bajarîyan mîyan de hema – hema nameyê nebatan ê kurdî zaf tay mendî.

Werdê ma yê Kirdone / Kirmancîyê ra: Ma taynîn xag – xag wenî, tîkîn powcenî û wenî, ê bînan kenî huşk / wişk û ma hema wenî.

Seba ke wendox wa pê fehm bikero, kam yew nebate ra, kamcîn heti werîyeno, mi nînan zî pê sembolan şima rê nîşan dayî: B:binê ardî, Ç: çay, M:meywe, P: pel, S: serê ardî, T: toxim, U: Usare, V:vile. Tay nebatê werdî ma zî, di yan hîrê hetî înan têdê werîyeno. Mi nînan zî sey (P & T) yan sey (B& P&V) ya mojnayo ra.

Nebatî ke xag-xag werîyenî :

Asparek / hanek, çonêr, kenger, nanê mîrçikan, poşmê, ribês, saya binerdî, şing, tirşik, tûzik...




Nebatê ke powcîyenî û sey tarr werîyenî :

Aw de qeşelnenî û parzûnenî, hakûn qilînenî ser û powcenî .

Derzînik / gezgezik, gelezan/ gelzûn, giştone, helerg / lerg, hêlûge /yeling, lexandûr / koksor, selmi / selmastik, xamazek / tolik, xatûnek...

Nebatî ke kenî huşke û hema wenî :

Alinca huşke, bakleyê huşke, batmice, eskice / mêwije, qaxe, salinca huşke, sûntuwale, tuye huşke...

Xoşawa ma ke meyweyanê huşkan a powcîyena:

Hêverî meyweyanê huşkî ke kenê xoşaw, pak temîz şuwenî. Quşxane de qasê xu aw girînenî, dima ra zî sûntulayê kenî de û hela ke di girayê amey po; batmicê, eskîce, alinc, salinc, dest de çi bibo, hemin yew ca de kenî quşxane, badê di girayan ra, qasê xu gore şeker kenî de, yewna girayek yeno po û qapax cenenî piro û quşqone adir ser ra anî war. Hetan hênik bo pawenî, bacê hema qapax ser ra darenî we. Kê ke quşxane hîn bi hênik, xoşaw kenî firaqan û wenî.

Nebatî ke boye û tahme danê werdan :

Anix / ûnix, nane, reyhan

Nebatê ke awê înan sey şit yan şîreyek yena war, pel yan sate daxeznenî yan vile ra sipenî û wenî.

Gezemîn, mismisok / mijmijok, vişk / vinişke, xanimek.

Nebatî ke vila înan werîyena:

elbik / şimlik , gulmenşag , heşvila / savila kurdistan, kolpize, vilika tawisî , pence xanim

Nebatî ke tira çay virazîyenî :

çaya koyî, çaya kurdî, çeqlet / çuxlet, êxlamûr, puşan, sûrgulîk



Werdê ma yê nebatan; ma Kirdone / Kirmancîye de taynîn xag - xag wenî, tîkîn ma powcenî û sey tarr wenî, ê bînan zî ma kenî huşke/wişk û hema wenî. Çendo ke mi dest ra ame, ez pê nameyanê Latînî û Kirdî ya, înan dana sinasnayiş.

**Nebatê ma yê ke werîyenî**

anix (Thymbra spicata. P)
arbûd (Medicago sativa.P&V)
arûng (Armeniaca vulgaris.M)
asparek (Crocus cancellatus. B)
balî / belû (Quercus. M)
çaya koyî (Stachys lavandulifolia. P)
çimbeloq (Centaurea Ç&P&S)
çuxlet ( Salvia stamenia. P)
delek (Euphorbia helioscopia. P)
derzînik (Urtica dioica. P)
dimê gayî (Verbascum. P&V)
dimor (Lolium temulentum. T)
dirik (Rubus caesicus. M)
elbik (Helichrsyum plicatum.V)
engura mîrçikan (Cerasus angustifolia. M)
êxlamûr (Tilia rubra V&T)
findiq (Corylus avellana.M)
gelzûn (Anchusa azurea.P&T&V)
gewen (Astragalus subrobustus. V)
gilabolî (Viburnum opulus. M)
gilheşe (Sorbus umbellata. M)
gingil (Acantholimon acerosum. B)
giştonek (Trigonella foenum-graceum. Bah)
gulbiza (İris persica. B)
hanek (Crocus chrysanthus. B)
harşi (Cichorium intybus.P&S&Ş)
helerge ( Heracleum trachyloma. P&S)
hengura mîrçikan (Ribes uva crispa. M)
hennab (Ziziyphus jujuba. M)
hergot (Echinops.B&P&S&V)
heşvila kurdistan (Paeonia mascula ssp.kurdistanica. V&P)
hêlûge (Eremurus spectabilis. P)
kardî (Eminium. P)
karî /kardû (Arum. P)
kelsim (Tussilago farfara.P)
kenger Gundelia tournefortii. B&S)
kilkor (Ferula szowitsiana. P&S)
kinêre (Cerasus mahaleb var mahaleb. T)
kino (Cannabis sativa. P)
kokvaş (Hordeum bulbosum. B)
kolpize (İris reticulata. B)
korek ( Setaria italica. T)
kuris (Arctium.P)
kuşne (Vicia ervilia.T)
lepa heşî (Malabaila. B&M&P)
lexandur (Amaranthus retroflexus. P)
linga malî (Crocus albiflorus. B)
lingê qanzî ( Falcaria vulgaris. P)
lîlik (Cornus mas.M)
mamûşag / gulmêşna (Viola. V)
maşik (Vigna sinensis. P )
melje (Asparagus officinalis. P&S)
mircol / mirclowr (Vicia cracca. T)
mirdvaş ( Plantago major. P)
mizeleq ( Ornithogalum narbonense. B&P)
nane (Mentha. P)
nanê mîrçikan (Capsella bursa-pastoris.P&T& S)
neqûrê leglegî (Erodium cicutarium. P)
nerebend (Scorzonera tomentosa.P)
nermoke (Euphorbia chamaesyce. P)
padûsek (Galium aparine. P)
parpar / pirpar (Portulaca oleracea. P)
pirûnek (Sonchus oleraceus. P)
pîyaz (Allium cepa. B&P)
poşme (Geranium. B)
punê hênîyan (Mentha aquatica. P)
qorç ( Pyrus elaeagnifolia. M)
qubazike (Malva sylvestris. P)
reyhane (Ocimum basilicum)
ribêse (Rheum ribes. P)
salinci/ încase (Laucocerasus officinalis. M)
sater (Satureja thymbra. P)
saya borî (Malus sylvestris. M)
saya mîrçikan (Sorbus domestica. M)
selmo (Chenopodium album. P)
serê mele (Caduus.B&Ç&P)
sêz ( Crataegus azarolus. M)
silqvaş (Amaranthus albus. P)
şing (Tragopogon.P)
sîrê koyî (Allium tuncelianum. B)
so ( Heracleum platytaenium. P)
sus (Glycrhiza glabra.B)
sûrgule (Rosa canina. M&V)
şabelû (Quercus brantii. M)
şing (Tragopogon pratensis.P)
talikê zaracan (Taraxacum officinale.P)
taro berxik (Silene vulgaris.P)
tarr (Rorippa thracica.P)
tastasik (Matricaria chamomilla.V)
telîyin (Sonchus erzincanicus. P)
teluyê beloq (Silybum marianum. S)
tirfiş (Prunus divaricata. M)
tirşik / tirşing (Rumex. P)
tirşika zaracan (Rumex acetosella)
tirşing (Rumex tuberosus. P)
tusî (Eryngium. P&S)
tûzik (Nasturtium officinale.P)
vila adirge (Ranunculus polyanthemos. V)
vaşê dîkan / vaşê koteran (Fumaria officinalis. P)
vaşê giştoneyî (Ononis spinosa,P&V)
vermure (Sorbus aucuparia. M)
veywek (Papaver rhoeas. T)
vila adirge (Ranunculus ficaria. B)
vilika kaşan (Campanula. P&S&V)
vizdewre (Lepidium campestre. P)
vizdorik (Nasturtium officinale. P)
xamazek (Malva neglecta. P)
xançerbarî (Gladiolus kotschyanus. B)
xanimek (Onosma argentia. V)
xatûnek (Silene alba.P)
xib / xibik (Elaeagnus angustifolia. M)
xozbalî (Quercus libani. Ş)
xurnik ( Ceratonia siliqua. M)
zîwan ( Cephalaria syriaca.T)

Humara bîne de nebatî ke sowbîna cayan de gurenayenî, ma ca bidê înan.

# Nihat Öner û şopa li dû kelepûrê



GÖNÜL GÜN

Li ser zimanê kurdî, ji ber pişaftin û qedexeyan, berhemên nivîskî bi awayekê azad di wextê xwe de baş nehatine nivîsandin. Her çiqas rewşeka wisa hebe jî ji alîyê din ve bi rîya kesên dildar û dilsozên çand û zimanê kurdî xebatên berhevkarîyê têne kirin. Yek jî van kesan Nihat Öner e ku nezî deh salan e li herêma Serhedê li bajarê Agirî û derdorê, li ser çanda kurdîya devkî, Serhildana Agirî û Komkujîya Gelîyê Zîlanê lê dikole û karê berhevkirîya keresteyên folklorîk dike.

**Serhildana Agirîyê û Komkujîya Gelîyê Zîlanê**

Nihat Önerê lêkolîner, berhevkar û nivîskar di sala 1985an de li gundê Qazî ya Agirîyê ji dayîk bûye. Nihat Öner destnîşan dike ku cara ewil bo mijara Serhildana Agirî û Komkujîya Zîlanê dest bi lêkolîn û berhevkarîyê kirîye û li ser vê yekê wiha diaxive;

"Min tim ji kal û pîran pirsa serhildan û komkujîyan dikir. Dema min dibihîst li gundekî şahidek, an zarokên şervan an şahidek hene, ez diçûme gundê wan. Ez carinan diçûm min didît ku di derbarê mijarê de zêde ne xwedan agahî ne, lêbelê ew jî min re qala çîrok û serpêhatîyan dikin. Min jî wisa qada xwe ya lêkolînê berfrehtir kir."

**"Şênîyên Agirîyê xwedî gencîne û behreka bêbinî ne"**

Lêkolîner Önen amaje dike ku dema ji bo Serhildana Agirî û Komkujîya Gelîyê Zîlanê gund bi gund digere, dibîne ku şênîyên Agirîyê di mijara çanda devkî de xwedî xizne û behreke bêbinî ne û wiha pê de diçe;

"Ez bi xwe jî gelekî liser mijara çanda devkî fikirîm; ti xebatên berhevkarîyê li vê derê nehatibûn kirin, divîyabû min zûtir dest bi vî karê pîroz bikira, ku hêj nifşên liser mijarê haydar dijîyan û zindî bûn. Min wisa dest bi berhevkarîya çanda devkî kir. Lêbelê di serî de ez difikirîm ku ez van xebatên xwe bikim pirtûk. Bi salan e ez him berhev dikim him jî tiştên berhevkirî dinivîsim."

**"Tûrîkê min, tûrikê çanda kurdî ye"**

Dema ku em ji Nihat Önerê lêkolîner û berhevkar dipirsîn "gelo di tûrikê te de, çi heye, çi tune ye" Öner dibêje ku tûrîkê min, tûrikê çanda kurdî ye. Nifirek jî bala wî bikişîne ew hergav li cem xwe, di quncikekî de wê nifirê dinivîse:

"Mijarên ku ez liser xebitîme û min berhev kirine ev in; destan, çîrok, çîrçîrok, metelok, lîstikên zarokan, bawerîyên gel yên nedînî, navê çêreyan, gotinên pêşîyan, biwêj, çîrokên biwêjan, ligor kurdan analîza însanan (mînak dibêjin destê mêrekê bi pirç be, ew bi merhemet (dilovan) e. Çavê yekî/ê şîn be, ew mirovan zû nezerî (çavîn) dike û hwd. Di pirtûka min a çapbûyî Mîrza Mihemed de pêncî çîrok hebûn, min niha pirtûkeka çîrokan xelas kirîye, ez ê van rojan bişînim weşanxaneyê, ew jî bi qasî Mîrza Mihemed e. Wekî din hê ji her du yan zêdetir bi nivîskî û bi deng di arşîva min de çîrok hene. Min herwiha min çend destanên kurdan dîsa nivîsîne, çend heb jî hê nenivîsîne, ez ê wan jî di demeka nêz de xelas bikim."

**"Li gorî mêran, çîrokbêjên jin xweştir û dirêjtir çîrokan dibêjin"**

Nihat Öner dîyar dike ku dema li qadê karê berhevkarîyê dikir tiştê ku herî zêde bala wî kişandîye ew e ku kal û pîrên kurdan behsa çîrokan bi awayekî kelecan û kêfxweş dikin.

"Li gorî mêran, çîrokbêjên jin çîrokan xweştir û dirêjtir dibêjin. Çîrokên ku jin dibêjin, tim ji yên ku mêr dibêjin bo mirov xweştir tên. Jin dineqişîne, bedew dike û şirîn şirîn dibêje. Mêr na, kurt dibire, gelekî kêm dike û tehma wê nahêle. Jinên kurd di mijara çîrokan de gencîne ne."

Berhevkar Öner destnîşan dike ku di çîrokan de herî zêde peyvên mirî yên windabûyî bala wî kişandîye. Dîsa Öner dibêje ew bûye şahid ku çîrokbêj di nava çîrokê de tiştekî dibêje, ew dipirse wateya wê çi ye? "Çîrokbêj bixwe jî wateya wan peyvên mirî an nizane an jî ji bilî çîrokê nikare maneya wê peyve jê derxe."

"Bawerî û edetên kurdan yên berê di nava çîrokan de hene. Ev gelekî bala min dikişîne, mînak; kevirê xwazginî, kevirê parsê. Dema tu herî ser kevirê xwazginî rûnî, xwedîyê malê dizane ku tu çûyî qîza wî bixwazî. Dema tu herî ser kevirê parsê rûnî, dizane tu çûyî parsê. Wekî din bi dehan bawerî û edetên bi vî awayî hene ku, divê xwîner çîrokan bixwîne ku baştir têbigihêje, ez dixwazim çi bêjim!"

Öner amaje dike di mijara dewlemendîya çîrokan de jî gundên li deştê li gorî gundên çîyê di mijara çanda kurdî de gelekî qels in. Lêkolîner Öner dibêje gundên li çîyê çîrokan pir dizanin, dema dibêjin jî dirêj dirêj dibêjin. Di nava çîrokên wan de mirov bi dehan gotinên pêşîyan, biwêjan û hwd. dibîne. Lê yên li deştê yan nizanin, bizanibin jî pir kurt in û rihê kurdî têde tune.

Piştî xebatên deh salan yê Nihat Öner, pirtûka wî ya ewil a bi navê "Mîrza Mihemed, Gurzek Çîrok ji Herêma Serhedê" ji weşanxaneya Avestayê derketîye. Ev pirtûk ji alîyê xwînerên kurdî ve elaqeyeka mezin dît. Çimkî taybetîya vê pirtûkê ew bû ku li Herêma Serhedê û li bajarê Agirîyê berhema berhevkirî a yekem tê hesab kirin. Her wisa pirtûk di nav berhemên zargotina kurdî de jî wekî berfrehtirîn pirtûk tê zanîn. Öner derheqê pirtûka Mîrza Mihemed de wiha dibêje:

**"Elaqeya lihember Mîrza Mihemed gelekî baş e"**

"Piştî ku pirtûk derket, elaqeyeka gelekî baş li hember pirtûkê çêbû. Belê, ez bi pirtûka xwe, xebata xwe bawer bûm, lê xwînerên kurd li ber çavan e, pirtûkek hezar lib çap dibe, ew jî di deh salan de xelas nabe. Lê elaqeya li hember Mîrza Mihemed gelekî baş e. Li her derê dinyayê mirov ji min re peyaman dişînin, li min digerin û pirtûkê dixwazin. Ev bû çend meh pirtûk derket, ez bawer im ber bi qedandinê ve ye. Min fêm kir ku mirov karê baş bike, ji bo miletê xwe dilşewat be, milet li mirov û li xebata mirov xwedî derdikeve."

**"Min destê xwe neda zimanê resen û herêmî yê çîrokan "**

Nihat Öner destnîşan dike di dema deşîfrekirin û nivîsandina çîrokan de wî bi aweyekî baldar dest nedaye resenîya çîrokan û weha pê de diçe;

"Heta ji destê min hat, min destê xwe neda zimanê resen û herêmî yê çîrokan. Lê hin çewtî/xeletî hene ku mirov paşê ferq dike, mînak; min pirtûka yekemîn çap kir, ez niha dêhna xwe didimê çîrokbêj hin cihan de gotîye 'min', hin cihan de jî gotîye 'mi', min gişt wekî 'min' nivîsîne. Divê çewan gotibû min wisa binivîsanda. Wekî din jî min mudaxileyî tiştekê din kir, ew jî ev e; çîrokbêj gotîye 'bûwû', 'çûwû', min ew kirine, 'bûbû', 'çûbû'. Wekî din zimanê çîrokbêj her çawa be, wisa hatîye nivîsandin. Bi kurtî bêjim, zimanê pirtûkê, zimanê herêmî ye"

Berhevkar Öner balê dikişîne ser resenîya çîrokên ku berhev kirine û dibêje dema mirov karekî dike, divê mirov di wî karî de xwe bi pêş bixe. Ez jî karê berhevkarîyê dikim, xwe di vê mijarê de pêş dixim. Min piranîya pirtûkên çîrokên kurdan xwandine. Çîrokên ku min di pirtûka xwe de çap kirine û yên ku ez ê di pirtûkên din de çap bikim, cara yekem e dê bêne çapkirin.

"Çîrokên ku min berhev kirine jî dibe ku navê hin çîrokan, bi yên çapkirî yên berhevkarên cuda re heman nav be, lê naveroka çîrokê cuda ye ango varyant cuda ne. Tiştê ku herî zêde bala min dikişîne ev e; ev nêzîkî deh salan e ez berhevkarîya çîrokan dikim, lê tu bêjî min nû dest pê kirîye, ez roj bi roj çîrokên nû dibînim û berhev dikim. Mînakekê bidim; diçim gundekî, malekê, çîrokbêj dipirse "te filan çîrok berhev kirîye?" ez dibêjim "na", îcar ew dibêje, ez qeyd dikim. Dinihêrim yeka din, yeka din û yeka din. Hezaran çîrokên kurdan hene û ji wan hezaran jî her yek ji wan, bi dehan varyantên wan hene. Lewma min hêca got çanda kurdan, behreka bêbinî ye."


Dema mirov pirtûka Nihat Öner a bi navê Mîrza Mihemed Gurzek Çîrok ji Herêma Serhedê dixwîne gelek çîrok û şîretan dibîne ku bi rîya ajelan hatine vegêrran. Öner derheqê vê yekê de dibêje kurdan di çîrokên xwe de qala jîyana xwe kirine. Mirov çîrokên kurdan bixwîne, mirov qet kurdan nas neke jî mirov têdigihêje ku kurd ji xwezayê û ji ajelan hez dikin û wiha berdewam dike:

"Ez mînakekê bidim, di çîroka ker, kûçik, pişîk û dîk de, ji mirovan re şîret hene; dixwaze bibêje ku; zilmê li ajelan nekin, ew jî can in. Wekî din tişta herî zêde bala min kişand, ew çîrok e ku dişibe "the Musicians of Bremen" a birayên Grîm. Ez dibêjim dibe ku wan jî ji kurdan hildabe. Malê kurdan, malekê berdestî ye, çimkî kurd bê dewlet bûne. Xwe jî nenivîsandîne kî/ê hatîye Kurdistanê, xwe re tiştek hildaye û birîye."

Berhevkar û lêkolîner Nihat Öner dibêje dema ew derketîye qadê, gel bawerîya xwe bi wî nedianî. An jî ber bawerîya xwe pê nedianîn yan jî guh nedidane kultura kurdî, nedixwastin çîrokan bibêjin. Öner balê dikişîne ser xalekê;

"Piştî ku pirtûk derket, boçûna xelkê baştir bû. Kesên ku pirtûkê dibînin yan liser tiştekî dibihîzin, ji min re têlefon dikin, dibêjin "Were mala me jî ez jî çîrokan dizanim." Heman kes, ez berê jî biçûma mala wan, nedigotin. Niha xelk hîn bêtir û cidîtir nêzîk dibin."

Öner heta roja îro ji ti derê, ti alîkarîyeke madî wernegirtîye. Tim bi derfetên xwe xebitîye. Carinan hinek alîkarî ji hin hevalên xwe stendîye.




Berhevkar, lêkolîner û nivîskar Nihat Önerê ku ev deh sal e gund bi gund bo zargotinên bi kurdî û dîroka serîhildana Agirî û komkujîya Gelîyê Zîlanê lê dikole, dibêje ku li Agirîyê çanda kurdîya devkî gelek dewlemend e.







Piştî xebatên deh salan yê Nihat Öner, pirtûka wî ya ewil a bi navê "Mîrza Mihemed, Gurzek Çîrok ji Herêma Serhedê" ji weşanxaneya Avestayê derket.

## "EZ Ê DERBARÊ SERHILDAN Û KOMKUJÎYAN DE ÇAR PIRTÛKAN ÇAP BIKIM"

Tê zanîn ku Öner di derheqê Serîhildana Agirîyê û komkujîyê de jî ev deh sal in lêkolîn û berhevkarîyê dike.

"Plana min ew e ku hevpeyvînên min ên bi şahid û zarokên wan re hatine kirin têxim pirtûkekê. Wekî din, di mijara Serhildana Agirî û komkujîyên têkildarê serhildanê de, li belgeyan bigerim û wan berhev bikim. Min heta niha ji sedî zêdetir belge berhev kirine ku tenê li cem min hene. Bîranîna çend serbaz û pîlotên tirkan hene ku min ew bi dest xistin. Wekî din min arşîvên rojnameyên wê demê gişt di ber çavan re derbas kir: nûçe, nivîs, wêne, karîkatûr çi hebe min giş hildan. Herweha di derbarê serhildanê de heta îro çi rojname, pirtûk, hevpeyvîn û hewl hebe min giş xwandine û navê şervanan berhev kirîne. Ku derfeta min çêbibe ez ê derbarê serhildan û komkujîyan de çar pirtûkan çap bikim: 1. Şervanên Agirîyê kî/ê ye, çawa beşdar bûye û aqûbete wî/ê bûye çi ye, 2. Hevpeyvînên bi şahid û zarokên wan re, 3. Serhildana Agirîyê di medyaya we demê de, 4. Serhildana Agirîyê di arşîvan de."


Önen li Agirîyê û hin bajarên der û dorê çiqas dengbêj hebin derheqê wan de jî agahî berhev kirine, gelek dengbêj jî hene ku di arşîva wî de ne. Önen dibejê hîn biryar nedaye ku wan çawa jî bo xelkê berdest bike.

“Hûn rûnanên?”

# Li “Medya Kitabevi” ango Kitêbfiroşê Medyayê -I



CIWANMERD KULEK



Medya Kitabevi rûpelek ji rûpelên herî tije ên jîyana Selahattin Bulut e, ji rûpelên temenekî ku di ti beşekî wî de êş û kul û derd kêm nebûbûn.

Polîsên ku ev sê sal bûn her meh, mehê muheqqeq du-sê caran dihatin dikana wî, sivikayî pê dikirin, sixêf digotinê û kitêbên wî giştûk davêtin erdê, pê li wan dikirin, û dawiyê ew kom dikirin û wan jî tevî wî û mêvan û xerîdarên li dikanê digirtin, dibirin qereqola li Cadeya Vatanê.

13ê Sibatê, roja duşemê, nîvrokî gava digihêjim meydana Taksimê, tiştekî ku bûye rûtîneke hevpeyvînên min ên vê dawiyê dest pê dike: berf. Lê berfa vê carê pirr hûrik, wek kayê ye; bayekî sar û şiliyeke sivik jî pê re tê û nahêle erdê bigire. Lepikên xwe dixim destên xwe û di yek ji kolanên herî xweş ên cîhanê, İstiklal, de bi lez dimeşim. Gelek caran ji gelek kesên li Stenbolê dibihîsim ku ev tax êdî miriye û xelk berê xwe didin deverên wek Kadıkoy yan Beşiktaşê. Kêmbûna mirovan, nexasim biyaniyan, -ji ber rûdanên terorî û tirs û fikarên dîtir- li cafe, bar û mixazeyên vê taxê ber bi çavê mirov dikeve, lê zehmet e mirov bawer bike ku rewaca vê semta herî qelebalix, kevnar, rengîn û zindî a bajêr nemîne. Di roja yekem a kar de, di hewaya dijwar de qelebalixeke ne hindik a mirovan nava cadeyê dagirtiye û heçku her kes ji bûyerên ku bajêr û welat dihejînin bêtir bi xema sermayê û çirava li kert û kortên cadeyê ketiye. Betonkirina rêka tramwayê a li nava cadeyê, pîneyên asfaltê ên li der û qiraxên dî, hin ciyên ku bi kevirên erdê hatine rastkirin, rûzemîna kolanê yekcar li nav hev xistiye. Di serî de bi nebûna tiştekî nahesim ku ti carî ji vê kolanê kêm nabe, heta ku hevdîtina min diqede û berêvarî vedigerim malê: muzîkjenên kolanê li navê nedixuyan. Di vegerê de, xweşbextane, li du stesyonên metroyê û li hêwana germ a keştiyeke mezin bû nesîb ku li muzîkên xweş ên amator guhdarî bikim.

Pênc deqe bimîne ji yekê re, ketim hundirê Pasaja (Qeyseriya) Elhamra a li hemberî dêra San Antuan, dêra herî mezin û qelebalix a Katolîkan a li Stenbolê. Hemû Kurdên ku vê hevokê bixwînin dê zanibin ez diçim kû. Dikanên cilan seranserê pasajê vegirtibûn û hilcoyên cilûbergan heta ber deriyan hatibûn û keç û jin wek kulmozê li wan civiyabûn. Li dawiya vê dalanê, li qorzîkeke xef, ji vê qelebalixê dûr, têlbendeke rojname û kovaran wek dareke qedîm bi tena serê xwe radiwestiya. Li ser camekana dikana piçûk û mutewazih a di wê qorziyê de, li ser lewheyeke zêravî, vî navê ku xwendevan pê dizane nivîsîbû: Medya Kitabevi/1996. Tam di wextê ku me qewil dabû hevdu de gihaştibûm wir, vî ciyê ku ji bo gelek Kurdan û biyaniyên meyl û meraqa wan li ser Kurdan bûbû navnîşaneke eşkere. Selahattin Bulut, xwedî, xweragir û berxwedêrê wê yê xîretkêş, bi xirqeyekî rîs ê bi nexş û êlekekî zer ê bi ser de li xwe kiribû li maseya darîn a li dawiya dikanê rûniştibû. Bi mirûzekî henûn û dilovan berê xwe da min û hêdîka bişirî. Min wek her car wiha pêjn kir ku ew ne xwedî lê hevalê wan kitêban bû ku çaraliyê dikanê dagirtibûn. Piştî ku destê xwe da min, pirsa xwe ya her car ji min kir: “Ka tu ê çi vexwî?” Gelek caran hatibûm, lê min heta wê rojê tiştek venexwaribû li wir. Her car yan ji ber karekî yan ji ber tiştekî min kitêb û kovarên xwe ji wir werdigirtin û berî ku bi lez û bez derkevim min digot: “Careke dî.”

Du hefte û du roj mabûn ku ev cîgeh bibûya bîst û yek salî, yan jî ji qewla Selahattin, bi hesabekî hîn nîşander û watedartir, hindik mabû nifşê çaremîn ê xwendekarên Kurdan -ên di hinga hebûna Medya Kitabeviyê de- ji zanîngehên Stenbolê derbiçûna. Êdî wext bû ku ez jî hinekî rûniştama wek mudawimên vir, ên ku ne tenê ji bo kirrîna kitêban lê ji bo ku werin çayekê vexwin û ji xwe re bîstikekê sohbet bikin sê wesayît diguherandin heta ku xwe ji perrekî dûr ê Stenbolê digihandinê. Nexwe ew car ev car bû û min vê carê bersiveke cuda da heman pirsê: “Ez ê çayekê vexwim.” Lêbelê, di maweya sohbeta me a ku ji sê saetan zêdetir dirêj kir de min ê qîma xwe bi wê tenê neaniya.

**“Hûn çi ji me dixwazin?”**

17ê Mijdara 1999an, sêşemê danê sibehê, rojeke xweş a tav, Selahattin Bulut tevî derçûyên kompîterê ên kitabeke Enwer Karahan a ku dê ji weşanên Dozê derketaya di kolana İstiklalê de dimeşiya. Vê roja xweş a payîzê, tenê tiştên xweş di hişê wî de hebûn; heta ku dengê qelabalixeke keç û xortan hatê; dora 60-70 kesî hebûn, bi dirûşmeyên bi Kurdî, ji hêla Tunelê berev Lîseya Galatasarayê dimeşiyan. Komeke dî a pirraniya wan jin jî li ber Kenîseya San Antuan rûdinişt. Tiştekî sosret bala Selahattin kişand û ma ecêbmayî: li derdorê ti polîs nedixuyan. Lê gavek şûn de dê tiştekî dî xuya bikira ku herçiyê ku nasnameya wî li ser bajarekî Kurdan hatibû tomarkirin û hesbilqeder wê rojê di wê kolanê re diçû dê li şûna wan heft xweziya xwe bi polîsên stemkar bianiya: girseyeke çavsor a netewperestên tirk. Girseya çavsor bi nav xwepêşanderan ket û hewil da wan lînc bike. Selahattin Bulut ev sê sal bûn tiştek nemabû ku ji destê polîsan nekişandibû, lê dîsa jî bi alîyekî dilê xwe wiha guman kir ku ew li wir bûna belkî êrîşkar wiha bi rihetî bi ser xwepêşanderan de neçûna. Lê berevajî gumanên wî, wê rojê piştî ku polîs hatin gihaştin wir jî, ji dêvla ku êrîşkaran rawestînin nav di wan da û wan hîn bêtir bera xwepêşanderan dan. Hetta piştî qederekê, xezeba polîsan jî bi ser a êrîşkaran de hat û ew jî bi nav mirovên li Kolana İstiklalê ketin. Ê ku kitûka wî li ser bajarekî kurdan bûya çûbû ji wî de! Dema xortekî dî jî dît, ê ku gava ji xwe re di wir re derbas bûbû, ew jî wekî wî -piştî êrîşkaran- ketibû nav lepên polîsan, gotibû belkî ew jî wek wî ji Mêrdîn bû; lê bersiva wî xortî rûyekî dî ê vê tiyatroya berbad raberî wî kir: Kurrik Tirkekî ji Yozgatê bû, lê li Rihayê ji dayik bûbû û li ser nifûsa wî bajarî hatibû tomarkirin ji ber ku dewletê bavê wî ji bo kar şandibû wir.

Piştî ku çavsoran hukmê xwe kir û çûn, û polîsan jî hunerên xwe yê her car kirin û bi gef û gurrên xwe ji ber nasname û karê wî yê kitêban tahde lê kir û ew çûn, Selahattin Bulut li dikana xwe ya li qatê duyem ê Pasaja Aznavurê careke dî li karesata jiyana xwe fikirî û pê êşiya. Janê yekcar da dilê wî û ne tenê di berdêla wê rojê, di berdêla hemû rojên ku wiha bi tahde û eziyet derbas dibûn de kerba dilê xwe di meqaleyekê de (Serbestî, 1999/Rêbendan) derxist û wiha kir gazî û hawar: “Hûn ji me çi dixwazin?” Polîsên ku ev sê sal bûn her meh, mehê muheqqeq du-sê caran, dihatin dikana wî, sivikayî pê dikirin, sixêf digotinê û kitêbên wî giştûk davêtin erdê, pê li wan dikirin, û dawiyê ew kom dikirin û wan jî tevî wî û mêvan û xerîdarên li dikanê digirtin dibirin qereqola li Cadeya Vatanê, dixistin nezaretxanê, Vaya li ku derên dî ên cîhanê hebûn? Ev înkar, ev tahde, evê rûtîna malkambax heta kengî dê dewam bikira?



Foto: Linda Dorigo

## PIRTÛKXANEYA MEDYAYÊ RÛPELEK JI JÎYANA SELAHATTIN BULUT E

Medya Kitabevi rûpelek ji rûpelên herî tije ên jiyana Selahattin Bulut e, ji rûpelên temenekî ku di ti beşekî wî de êş û kul û derd jê kêm nebûbûn. Evî rûpelê dawî ê bi êş û tahde di 1ê Adara 1996an de dest pê kiribû, piştî ku hatibû Stenbolê bi heft salan; wê rojê Medya Kitabevi cara yekem li Pasaja Aznavurê vekiribû û ji wê rojê de zilm û zext ji ber deriyê wî neçûbû. Li qatê duyem ê wê qeyseriyê hem di nav bobelatên jiyana xwe ya zehmet de dikeliya, hem guwahî (şahidî) li derd û meseleyên li hawirdorê xwe diqewimîn dikir. Ji wê derê Dayikên Şemiyê ên li ber Lîseya Galatasarayê rûdiniştin didîtin û bi wan diêşiya, ji alîyê dî de jî ji alozî û pevçûn û çalakiyên siyasî ên ku ji kolanê kêm nedibûn di nav pêlên hêvî û bêhêvîtiyan de xerq dibû û bi rojeva sor a welat dikewgirî. Di doxeke wiha dijwar de kitêbxaneyek vekiribû bo ku Kurd bigihêjin kitêbên bi Kurdî yan bi Tirkî lê li ser Kurdan. Sê çar weşanxaneyên Kurdan ên ku hebûn wê demê kitêbfiroşek nedidît ku kitêbên xwe li wir belav bikin û bidin firotin. Derbirrîn û afirandina bi Kurdî hîn jî pirr zehmet bû û bi qandî ku refên wê dikana piçûk dagirin kitêbên Kurdî û ên li ser Kurdan jixwe tune bûn. Ji bo ku refên dikana wî ya kitêbfiroşiyê vala xuya nekin, ji bo ku hejmara kitêbên ku her meh tûşî serdegirtin, pêpeskirin û birina polîsan dihatin zêde xuya bikin, Selahattin qabên piskuwîtan, qutiyên karton ên alavan dixistin refan û kitêb dispartin wan û wan li kêleka hev bi pahnî datanîn. Çi cara ku polîsan dihat ev kitêb ji hev dixistin, hişka bi şerît û qinaban girêdidan û dibirin Selahattin bi pey wan diket, dû wan bernedida û ji bo ku wan şûn de wergire serî li Mehkemeyên Dewletê ên Ewlehîyê dida, heta ku çend mehên dî ew cardî dianîn. Dizanibû ku ew kitêb êdî nema dihatin firotin, -giştûk di embar û depoyan de nedawî dibûn û diriziyan -lê sirf ji bo ku dewletê negotaya ku Kurd guh li kitêbên xwe nakin û nayin li wan nabin xwedî, diçû ew dianîn û dû re bê heq li xelkê belav dikirin.

Piştî çar salan, piştî vê qonaxa tije êş û bela, sala 2000î, hatûçûya polîsan ji binî de rawestiya. Cara dawî du polîsên sivîl hatin; nedişibiyan ên berê, hinekî nermtir û bêdengtir bûn. Rûyê wan sar û betilî bû. Wek ên berê bi nav kitêban neketin û ew neavêtin erdê, çêr û sixêf li alîyekî, weku nizanibûn dê çi ji wî re bibêjin wan li Selahattin nihêrî. Wan hew çavek li refan gerand û dû re axîneke bêhêvîtîyê kişand. Ref hinekî dî tije bûbûn. Serwext bûbûn ku Selahattin dê dev ji wî karî bernedaya. Milên wan, heçku bê can û ruh, bi acizî bi kêleka wan ve dadileqiyan. Wan kesereke dawî kişand û berê xwe da derî. Çaxa kirî ku derkevin, li ber derî, yek ji wan zîvirî û gazin ji wî kir: “Te çayek jî neda me.”

Selahattin Bulut hebekî şaş ma; ti carî ji wan rastî miameleyeke wiha nehatibû. Rojekê negotibûn ka em hinekî rûnên jî. Belkî yekem car da xwe û xwest wek hemû mêvanên xwe çayekê bide wan jî. Lê ew rûneniştin, lêxistin çûn. Tevî ku gava derketin, ev gotin ji devê wan -û belkî ji dilê wan jî- derket: “Bila bimîne careke dî.”

Kê dizanibû ew cara dawî ye?! Nema hatin.



FIRAT CEWERÎ

Sirgûn û edebiyat

Di hemû deman de, li hemû deveran, nivîskar û entelektuelên ku nexwestine li ber hukumdar û desthilatdaran serî bitewînin, bibin şelaf û şabaşvan, ew an mecbûrî jiyana sirgûnê bûne, an jî ketine zîndan û tîmarxaneyan. Hê di dema antîkê de, gava Sokrates li kuçe û kolanên Atînayê û li agorayên fikir û ramanan hewl dida ku bi xortan re têkeve kûrahiya fikrê û felsefeya abstrak konkret bike, ew bû hedefa êrîşa desthilatdarên Atînayê. Li gora desthilatdariyê, fikrên wî ji bo xortan talûke bûne. Sokrates bi xapandina xortan û bi Xwedênenasiyê hat sûcdarkirin. Cezayê sûcê wî giran bû; yek jê sirgûn, ya din zîndan bû; di zîndanê de jî îdam bû. Diviyabû Sokrates ji van herduyan yek hilbijarta.

Sirgûn ji bo wî ji mirinê zehmettir bû, şewata di nav agirê tenêtiyê de bû. Ew ê li sirgûnê têketa gerîneka tenêtiyê, têk biçûya û roj bi roj bi hesreta cih û warê xwe biheliya.

Wî zîndan hilbijart, di zîndanê de jî tasa jehra xwe bi destê xwe vexwar û bi aramî ket xewa ebedî; bû Sokrates. Qedera Ovidius jî mîna ya Sokrates bû, ew ji ber kitêbeke xwe û fikir û ramanên dûrî serdestiya Romayê, zîndanî nebû, lê sirgûn bû; sirgûnî bajarê Tomisê, peravên Deryaya reş bû. Ev sirgûna ku ji aliyê Augustus ve hatibû fermankirin ji ber şiîrên Ovidius ên erotîk bûn, ku ne li gora qalibê sîstemê û terbiya welêt bû. Loma diviyabû şaîr dûrî welêt biketa. Ovidiusê ku bi erda xwe, bi bajar, meriv, dost û hevalên xwe ve pir girêdayî bû, jiyana sirgûnê jê re pir dijwar hat. Ew li sirgûnê diheliya, nostaljî lê bûbû wek nexweşiyekê û wê nexweşiya bêderman ew roj bi roj dixwar.

Di warê azadiya fikirê de sedsala bihurî û sedsala ku em tê de dijîn jî ne dûrî serdema antîkê ye. Di dema desthilatdariya bolşevîkan de gelek nivîskarên sovyetî ên ku xwestin rûmeta xwe ya entelektueliyê biparêzin, ketin ber xezeba bolşevîkan. Ew an sirgûn bûn, an jî ji aliyê desthilatdariyê ve hatin girtin û sewqî tîmarxaneyan bûn. Li gora bolşevîkan, ên ku sîstema sosyalîzmê rexne dikirin diviyabû kêmaqil bûna û cihê kêmaqilan jî di sîstema prosesa avakirina komunîzmê de tunebû. Yê ku pêşî bû qurbana şoreşê, şaîrê şoreşê Mayakovskî bi xwe bû. Piştî xwekuştina Mayakovskî, gava ku sîstem rûdinişt, êdî sîstemê bi awayekî sîstematîk berê xwe dida nivîskar û entelektuelên rexnegir. Wan dixwestin wê kaniya edebiyata Rûsyayê ya ku ji çavkaniyan Gogol, Puşkin, Tolstoy, Dostoyevskî, Çexov û hwd, diza, bimiçiqînin. Wan dixwestin hemû kes bibin şabaşvanên wan. Hin şaîr û nivîskarên ku li ser ya xwe man, wek; Anna Ahmatova, Boris Pasternak, Nina Berberova, Aleksandr Solzjenitsyn ketin ber xezeba sîstemeke ku bi navê edalet, azadî û wekheviyê hatibû ser hukum. Ev nivîskarên ha mehkûmî zindan û sirgûnan bûn.

Di dema şerê cîhanê ê duwem de, bi derketin û biserketina fikra nasyonalsosyalîstan de, nazîstên ku li dû avakirina sîstemeke pak ya ji xwîna miletê arî bû, berê xwe dabû gelên ne jî vê nijadê. Digel ku vê îdeolojiyê hejmareke mezin ji fikir û miletên din jî kirin qurban, lê bêtir berê xwe dabû cihûyan û dixwestin koka cihûyan biqelînin. Bi milyonan cihû bûn qurbana îdeolojiya nazîsmê.

Bi dehan nivîskarên cihû ji Almanya, an jî ji welatên hevalbendên nazîstan sirgûn bûn. Witold Gombrowicz ji Polonyayê koçî Arjentînayê kir. Yek ji nivîskarên ku li seranserî Almanyayê kitêbên wî hatin şewitandin û di sala 1955an de li sirgûnê, li Züricha Swîsreyê wefat kir jî Thomas Mann bû. Kurt Tucholskyê ku xwe ji ber zilma nazîstan dabû alî û koçî Swêdê kiribû û niha ji aliyê PENa swêdî li ser navê wî xelatek tê belavkirin, ji ber êşa sirgûnê nekir der û xwe li Swêdê kuşt. Bertolt Brecht jî yek ji navên naskirî ye ku nazîstan hem kitêbên wî şewitandine, hem jî ew mecbûrî jiyana sirgûnê kiriye. Bertolt Brecht di jiyana xwe ya sirgûnê de jî nikaribû li cihekî bisitiriya, loma ew li sirgûnê her sirgûn dibû, li gelek welatên Ewrûpa û Skandînavyayê geriya û niştecî bû.

Cûntayên leşkerî ên Emerika Latînî, Yunanîstan, Tirkiyê û hin welatên Efrîqayê bûne sebeba ku nivîskar û entelektuelên wan welatan ji cih û warên xwe derkevin û berên xwe bidin jiyana sirgûnê. Herweha îdeolojî û desthilatdariyên Baasê, şerê navbera Îran û Iraqê û fundamentalîsma îslamî jî bûye sebeba ku nivîskar û entelektuel nikaribin li welatên xwe bisitirin, bi azadî binivîsin û loma mecbûrî jiyana sirgûnê bûne.

Jiyana sirgûnê ji hin nivîskaran re bûbe zîndan jî, ji hinan re jî bûye çavkaniya afirandinê û ew nemir kirine.

# Bi stranên "Sîya Şevê" ber bi ronahiyê ve



JÎN MAZÎ

Ne hewce ye ku stranbêj an jî xebatkarên hunerê perspektîfa xwe ji siyasetê dur bixe, li vir pirsgirêkên rastîn û mezin: Ramanên klîşe, gotinên klîşe, muzîkên klîşe ne.

Qet ji sîyê netirsin, li cîhê ku sî hebe li wê derê ronahî jî heye. Dema min li stranên Siya Şevê guhdarî kir ev gotin hatin bîra min. Ji guhdarîkirina stranên Siya Şevê netirsin, di stranan de bêhêvîbûn û dilên şikestî hene, lê piştî ewqas tişt strana bi navê "Bihar" tê "û gulên sor hat bû bihar, şîn bû dar û darûbar." Carina jî di strana "Derew e" de em xwe li dû evîneke xapînok dibînin û ev gotinên stranê ji ser lêvan naçe: "Lê Lê şev derew e/ Reş û spî derew e/ Tu xewnî, xewn derew e/ Were min bixapîne." Sîya Şevê yek ji komên muzîka kurdî ye ku di şêwaza rockê de distrên. Heta niha 3 albûmên wan ên bi navê "Zeng","Pûç" û "Bêyom" derketine. Solîstê komê Gokçe Selim ji heftenameya Basê re behsa komê û muzîkê kir.

Solîstê Sîya Şevê Gökçe Selîm ji damezirandina komê heta niha di nav karên muzîkê de ye û hîn jî ligel tunebûna derfetan bi dilxweşî xebatên xwe didomîne. Gokçe ji me re behsa avakirina komê û zehmetiyan dike: "Dora sala 2001ê li zanîngeha Rihayê em hatin cem hevdu û bi muzîkê re eleqeya me hebû. Wê demê me koma xwe ava kir û navê komê kir Sîya Şevê. Dawiya çend salan, me albumên bi navê "Zeng" "Pûç" û "Bêyom" derxistin. Ya rastî karekî dirêj û bi stres bû û hîn jî bi vî awayî didome, ez dikarim vê bibêjim."

> Muzîk an jî huner bi awayekî xurt were kirin, hunermend bi qeyda telefonê jî dikare karekî baş derxîne.

**Zimanê kurdî zimanekî bi aheng e**

Zimanê kurdî yek ji wan zimanan e ku mirov dikare pê sînema, wêje û gelek hunerên din pêk bîne. Yek ji wan beşan jî muzîk e û di dema mirov şêwazên cuda li gor zimên dîzayn dike xebatên baş jî derdikevin holê, yek ji wan şêwazan jî muzîka rock e. Sîya Şevê jî yek ji wan koman e ku bi awayekî şêweya xwe bi zimanê xwe pêşkeşî guhdarên xwe dike. Solîst Gökçe Selim li ser vê mijarê fikrên xwe weha diyar dike: "Zimanê kurdî ez dikarim bibêjim ji bo her tarzên muzîkê pêkan e, ji ber ku kurdî bi xwe zimanekî bi aheng e, zimanekî fireh û dewlemend e, li gor baweriya min xebatên bi hest û zanebûn dewlemeniya vî zimanî ew ê bêtir bi pêş bixe."

**Kêmasiya hunerê wijdan e**

Tu beşên jiyana kurdan tune ye ku bi siyasetê re rûbirû nemaye û siyaset daxilî nav xebatan nebûye. Dema em bala xwe didin şêwaza Sîya Şevê ji xwe li hemberderketina pergalê, qebulnekirina neheqiyê xwe di stranan de nîşan dide. Ji xwe muzîka rockê helwesteke polîtîk e û îtiraza li dijî polîtîkayên dewleta jî nîşan dide. Di vî warî de Gokçe Selim weha dibêje:

"Ne hewce ye ku stranbêj an jî xebatkarên hunerê, perspektîfa xwe ji siyasetê dur bixe, li vir pirsgirêkên rastîn û mezin: ramanên klîşe, gotinên klîşe, mûzîkên klîşe ne. Yanî xebatkarên hunerê, bo nimûne muzîkjen û stranbêj, dikarin bi hunerên xwe bibin pêşengên siyasetê jî. Mesele tiştên elimandî û tiştên jiberkirî ne, ev mesele li ser evîndariyê li ser xwezayê yan jî li ser her awayê hunerê, xwe wekî nexweşiyekê derdixîne holê, siyaset ne tiştekî xirab e. Kêmasiya hûnerê wijdan, hest û zanebûn e."



**Ma derfetên Qerapetê Xeco hebûn?**

Derfetên kêm ên muzîka kurdî gelek caran dibin sedem ku hunermend xebatên xwe bi awayekî baş pêk neynin. Lê gelek hunermend an jî kom hene ku ligel kêmbûna derfetan jî xebatên pir serkeftî derdixin holê. Sîya Şevê yek ji wan koman e ku ligel tunebûna derfetên baş vê yekê ji xwe re nakin hincet. Gokçe vê rewşê wiha şîrove dike: "Min ji karê hunerê an muzîkê ev tişt fêm kir ku hebûn an tunebûna derfetan ewqasî ne girîng e, muzîk an jî huner bi awayekî xurt were kirin, hunermend bi qeyda telefonê jî dikare karekî baş derxîne. Ma derfetên Qerapetê Xeco hebûn?"

**Mija şer, ser hertiştî girtiye**

Solîstê Siya Şêvê Gokçe Selîm li ser celebên muzîka kurdî û rewşa heyî ramanên xwe weha par ve kirin: "Di muzîka kurdî de tarzên nû û tiştên xweş hene, belkî em dikarin bibêjin kêm e, lê di van rojên giran û zor de divê mirov baş binêre û guhê xwe veke ku bibine û bibihîse, li çar hêlê Kurdîstanê şer e û mija wê li ser her tiştî girtiye, ji ber vê yekê jî çavên me û dilên me divê jî bo her tiştî vekirî bin.

Yek ji stranên Sîya Şevê "Şer şer " e; dema ez li çîroka vê stanê dipirsim, solîstê Sîya Şevê yekser behsa şerê li her çar parçeyê Kurdistanê dike û weha dibêje: "Li bakurê Kurdistanê, li başurê Kurdistanê, li Rojava û rojhilatê Kurdistanê şer heye, ev çîrok her tim hebû, îro jî bi gemara xwe heye."



**Konsera Sîya Şevê û Koma Wetan**

Solîstê Sîya Şêvê behsa albuma nû ya pêşerojê dike û herweha Sîya Şevê di heyva Nîsanê dê bi solîstê Koma Wetan konserekê li dar bixe. Di vî warî de Gokçe weha dibêje: "Albuma me ya çarem qediya tiştên teknik û aborî mane. Konser, hûn jî zanin dewleta tirk ne şaredarî ne jî salon hîştin, ji loma em jî li salon û dikên alternatîf cî digirin, 7ê Nîsanê li Stenbolê û 8ê Nisanê jî li Enqereyê bi mamoste Kerem Gerdenzerî re em ê derkevin sehnê."